Azadiya
# WELAT
Rojnameya Hefteyî
SAL: 2 83
30 Gelawêj-5 Rezber (Ağustos) 1997
BUHA Fiat: 75.000 TL




# Tirkiye şer teşwîk dike

**Hevpeyvîn:**
## Huner helwesteke paqij dixwaze
Rûpel 8-9

**Medenî Ferho:**
## Nirxandina rewşenbîran di wateyên îroyîn de
Rûpel 4

**Jan Dost:**
## Hîn hinek rih di min de maye...
Rûpel 10

www.arsivakurdi.org

## NAVEROK



6

Ahmed Huseyîn: Ruhê 1'ê Gulanê PKK dide jiyandin



7

Nûçe: Konferansa Yekemîn a Jinên Kurd



12

Çetîn Mîzan: Dûrikên dawetan

## Ji Xwendevanan

*BI derketina Tevgera Azadiyê re gelek nirxên bi rûmet hatin afirandin, di roja me ya îro de ev nirxên ku hatine bidestxistin bi xwîna leheng û şehîdên nemir hatine afirandin. Mînak Azadiya Welat, MED–TV û hwd. Ger em bizanibin ku ev nirxên bi rûmet bi xwîna şehîdên nemir hatine afirandin. Lazim e ku heya dawiyê em xwedî li wan nirxan derkevin. Lê mixabin, em ji vê peywirê zehf dûr in. Gelo çipas piştgiriya Azadiya Welat dikin? Me ev pirs çiqas ji xwe pirsiye, me çiqas Azadiya Welat xwendiye û daye xwendin. Em wê bizanibin ku li Azadiya Welat xwedî derketin, xwedî derketina li xwîna şehîdan e. Çimkî ev nirxê ku hatiye avakirin bi bedeleke giran hatiye bidestxistin. Îro ji her neteweyê zedetir lazim e gelê kurd li nirxên xwe yên bi rûmet xweditiyê bike.*

*Bi derketina Azadiya Welat re em ji hinî zimanê xwe yê zikmakî, hinî xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bûn. Lê belê ji bo xebatkarên Azadiya Welat rexneyekê me heye. Em dizanin ku hebûna me û tûnebûna me bi girêdana tevgera azadiye re ye. Îro bi hezara şehîdên nemir ji bo afirandina van nirxan xwîna xwe dane rijandin, lê mixabin di rûpelên Azadiya Welat de li ser bîranîna şehîdên nemir kêm nivîs tên weşandin. Daxwaziya me ew e ku di her hejmarê Azadiya Welat de li ser jiyana şehîdan bîranîn werin weşandin.*

GIRTIYÊN PKK'YÎ /BATMAN

## Em çiqas berpirsiya xwe bi tînin cih?

SAMÎ TAN

Ev çend hefte ne ku wekî rojnameyeke ku xwe di nav eniya azadîxwaz û aştîxwaz dibîne, em li ser çalakiyên aştiyê radiwestin. Îsal ji ber çalakiyeke navneteweyî dengê aştiyê berztir bû. Her çiqas hêzên tarî xwestin vî dengî bibirin jî, bi ser neketin. Kevokê aştiyê ref bi ref berê xwe dane welatê rojê, balindeyên leşxur hew dikarin li ber wan bibin asteng, heke li ser ya xwe neyên xwarê dê bi ber vê lehiyê bikevin.

Tava şoreşê tîna xwe daye dilê zarokên rojê, gurgeboz û teyr û tilûrên leşxur nema dikarin agirê nava dilê wan vemirînin. Refên bazan hêviya azadî li seranserê welatê rojê belav kirin, ref bi ref berê xwe didin nava Anatoliyê, heke ev tîna şoreşê xwe bide nava dilê gelên Anatoliyê jî, êdî kedxwar û kujer hew dikarin bibin bend li ber lehiya şoreşa gelan.

Hestên şovenîst çavên hinekan kor kirine, ji bilî kuştin û şewitanê bîr nabine tiştekî. Ew êdî nizanin ku berjewendiyên wan di ku de ne. Tênagihîjin ku aştî ji bo wan riya felatê ye.

* * *

Doza gelê me şewq û şemala xwe daye seranserî cîhanê, gelê me ber bi azadiya xwe ve dimeşe. Lê hê jî mirov dibîne gelek ji me di giringiya vê qonaxê negihîştine. Me xwe ji kirêtiya rejîmê neşûştiye. Her tim tê gotin pêdivî bi li–xwe–vegerînê heye; pêdivî li çand, ziman, dîroka xwe vegerînê heye.

Divê em bi zanistî giraniya xwe deynin holê. Dema em vê yekê bikin, em dikarin hevkêşeyê di aliyê xwe de biqulibînin. Lê em hê nikarin rojname û kovarên xwe bi deh hezaran bifiroşin, gelek ji me nizanin bi zimanê xwe bîr û ramanên xwe bîne zimên.

Di warê dîplomasiyê de jî kurdên li metropolan bi qasî kurdên Ewrûpayê ne jêhatî ne. Kurdên li Ewrûpayê bi tevger û xebata xwe bandorê li raya giştî ya Ewrûpayê dikin, lê yên metropolan dengê xwe nagihînin cîranên xwe jî.

Xuya ye ku di nav van mercan de derxistina rojnameyeke baş gelekî dijwar e. Rast e digel warê siyasî, di warê çand û zimanê kurdî de gavên gelek mezin hatine avêtin. Îro dema em hinek nivîsên ku digihîjin destê me dixwînin, em gelekî kêfxweş dibin. Ji tunebûnê bi hezaran xwendevan û nivîskarên zimanê kurdî çêbûne. Ji ber ku di vê yekê de keda me jî heye, em serbilind in.

Lê dema mirov rewşa hinek mirovên me yên li metropolan dibîne, gelekî bêzar û xemgîn dibe. Bo nimûne li navçeyeke HADEP'ê ku lê bi hezaran kurd dijîn, ji sê hejmarên Azadiya Welat bi tenê du heb hatine firotin, gelo ew çi sersarî ye? Mirov dikare bibêje ku rayedarên vê navçeyê di giringiya qonaxa ku em tê re derbas dibin gihîştine? Gelo kesên ku nikarin du heb Azadiya Welat bifiroşin, çiqas rola siyasî ku dikeve ser wan pêk tînin?

Heke ji heyetên ku tên yek ji wan bipirsin: Çend jî we dikarin bi kurdî bixwînin, ewê çi bersivê bidinê?

# Barzanî rola Rayber dilîze

RECEP AKAMIŞ

**Mesûd jî wekî hêzên kedxwarên romî ji Nexweşxaneya Azadiyê keçeke kurd derxist, şehîd kir û dilê wî rehet nebû, bi dû panzerê ve girêda û li kolanê Hewlêrê gerand.**

Dema împeryalîzm welatekî dixe bin destê xwe berî her tiştî ji xwe re hevalbendan peyda dike, da ku karibe li wî welatî xwe jiyan bike. Her wekî li Wietnamê Dîem, li Kubayê Batîsta, li Çînê Çan–Kay–Şek û hwd. Împeryalîzm bi destê van hevalbendê xwe welatê bindest talan dike. Her diçe ew hevalbendê împeryalîzmê xisletê împeryalîzmê digirin. Jiyana wan xayînan, li ser xwîna mirovan e. Ancax bi vî rengî xwe bi împeryalîzmê bidin pejirandin.

Ji van xayîn û xwefiroşan, yek jî di Kurdistanê de, Barzanî û malbata wî ye. Lewra di dîrokê de gava ku yekîtiyek di nava gelê kurd de çêdibê an jî hinek "serok" û welatparêz ji nava gel derdikevin, ew xayinê xwefiroş bibe asteng, wan însanên qehreman ji holê radike. Seyda mele Evdillahê Timoqî li ser rewşa Barzanî û îxaneta wî wiha dibêje: "Nirxa gelê kurd ji bo wan bi deh qurişan e. Ez gelek salan di nava wan de mam. Bêhna kurdîtiyê û welatparêziyê jî kîjan endamî dihat ew ji holê radikirin. Ez bawer im ku ew ne kurd bin."

Di heyameke kin de gelek derfet ji bo yekîtî û şoreşa Kurdistanê çêbûne. Ji van derfetan yek jî di dema şoreşa Îranê li rojhilatê Kurdistanê çêdibe. Di vê valahiyê de ev xayinê Berzanî ji bo dagirkerên Îranî li hemberî PDK'ya rojhilat, bi rûyekî reş wekî piyonekî êrişên giran pêk tîne. Bazirganiyek bi xwînê li ser gelê me dide meşandin. Bi derketina şerê Îran û Iraqê ew bi kuştina kurdan û bi bazirganiya xwînê mijûl dibe.

Bi vî rengî di hundir de gelek lehengên şoreşger û welatparêzên wekî Sait Elçi, Sait Kirmizitoprak jî bîr ku, di dilekî pak li xelasiya Kurdistanê digerin jî holê radike. Her wiha qetilkirina Elî Esker û 700 hevalên wî her kes dizane ku çawa termê wan li ber tava havînê diwerime. Cehş ên vî xayînî bi hovîtiya xwe pêçiyê wanşehîdan dibirin ji bo ku gustîlên wan derxin. Her wekî qetilkirina endamê Komîteya Navendî PKK'ê heval Mehmet Karasungur, heval Berîtan û bi sedan şehîdên şoreşê.

Dîsa hevalbendiya ku bi faşîzma tirk re dike û êriş dibe ser Tevgera PKK ê. Dîsa di dema borî de hevalbendiya ku bi Saddam re kir bazirganiya xwînê nebe lê çi ye ?

Êrîşa ku faşîzma tirk li başûrê Kurdistan kiriye, careke din jî hat xuyakirin ku di bin pêşberiya (pêşengiya) xayin Barzanî de pêk hatiye. Her kes dizane ku dewleta romê neyarê gelê kurd e. Lê belê wehşeta ku Mesûd û zilamên wî li Hewlêrê li ser saziyên gelê kurd û Nexweşxaneya Azadiyê daye meşandin, Hitler û Musolînî jî li ser gelan nekirine. Çalakiyên Hitler û Musolînî ji bo armanceke bûn. Lê armanca Mesûd çi ye? Dewleta tirk şoreşgerên ku şehîd dikirin, bi pey panzeran ve girê didan û li kolana digerandin. Ev yek li gelek deverên bakurê Kurdistana hatiye kirin. Mesûd jî ji Neweşxaneya Azadiyê keçeke kurd derxist, şehîd kir û dilê wî rehet nebû, bi dû panzerê ve girêda û li kolanê Hewlêrê gerand. Piştî vê wehşêtê kî dikare bibêje Mesûd kurd e, an jî di navbera wî û faşîstê tirk de cudatiyek heye? Kesê ve yekê bibêje ew jî dibe hevalbendê Mesûd û îxaneta wî.

Bila hemû kes bizanibin ku xayinên wekî Barzanî di nava hemû şoreşên neteweyî de ji ber dadgeha gel xelas nebûne. Çend sal berê kurdan navê zarokên xwe datanî Barzanî an jî Mesûd. Lê ji vir şûn de her wekî ku Nurî Dersîmî wesyet kiriye "Bila kes navê zarokê xwe neke Rayber" pêwist e, ew kesê ku navê Barzanî û Mesûd li zarokê xwe kiriye ji navê wî biguhere!

**ROJA** 27'ê Gelawêjê ji 100'î behtir kesên aştîxwaz û demokrat piştî rûdanên li dijî trênê bi balafiran hatin Stenbolê. Di nav heyetê de, ji Afrika ya Başûr Berpirsê Karên Edaletê Îmam Solomon, ji Îtalyayê parlementerê partiya komunîst Cacellî, Profesorê Frensî Daumas û Nivîskar Jouan çend ji navên girîng in. Her wiha hate diyarkirin ku bi tevî heyetên ku wê bên roja 31'ê Gelawêjê roje yekşemî di serî de HADEP, gelek partî, rêxistin û saziyên demokrat û welatparêz, wê li îskeleya Kadiköyê bicivin û wê ji wir bikevin riya Amedê. Her wiha wezareta karê hundirîn ya dewleta tirk jî diyar kir ku wê destûr nedine wan ku biçin Amedê.


**HEYETA** HADEP'ê roja 27'ê gelawêjê ji bo ku lêkolîn û lêgerînên xwe der barê ambargoya xwarinê, topbarandina li gundê Halvoriyê û pest û kotekiya li ser gel pêk bînin çû Dêrsimê. Heyeta ku ji rayedarên HADEP'ê pêk hatibû, bi Walî Atil Uzelgün, Serokê Şaristaniyê Mazlum Arslan, nûnerên rêxistinên demokratîk û bi serokê EMEP'ê Necati Tatmaz re hevdîtin pêk anîn. Di hevdîtinan de Walî Uzelgün, tewra dewletê bi gotinên xwe dubare kir û da zanîn ku qaşo li ser gel tu pest û kotekî çênebûne. Lê Serokê Belediyeyê Mazlum Arslan, nûnerên rêxistinan û serokê EMEP'ê li dijî gotina walî dane zanîn ku pest û pêkutiyan dane ber qirikê.

## NÛÇE

### Tarık Ziya Ekinci:

# Tirkiye şer teşwîk dike

**Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di bernameyeke MED–TV'yê de helwesta ÎP'ê bi zimanekî tûj rexne kir û da zanîn ku ew ketiye milên faşîstan. Öcalan li ser helwesta dewleta tirk jî ev nirxandin kir: "Dewleteke ku ev qas kesên navdar wekî terorîst bi nav bike, wê çi neyine serê kurdan?"**



TARIK ZİYA EKİNCİ

**Trêna Aştiyê ya Musa Anter"** digel hemû astengiyên dewleta tirk her diçe bêhtir di rojeve raya giştî ya cîhanê de cih digire. Bi taybetî piştî rênedana Almanya û Bulgaristanê raya giştî bi şêweyekî hûrbîntir li ser vê projeyê rawestiya. Kesên beşdarî vê çalakiyê bûn jî dan zanîn ku ewê digel hemû astengiyên dewleta tirk jî di 1'ê rezberê de li Amedê bin. Lewre ji niha ve gelek heyet hatine Stenbolê, ji bo ku piştî mîtînga 31'ê gelawêjê ku wê li Meydana Kadıköya Stenbolê çêbe, herin Amedê. Dîsa bi dehan sazî û rêxistinên demokratîk heta niha piştgiriya xwe ji bo vê mîtîngê diyar kirine. Her wiha tê hêvî kirin ku li Amedê jî bi sed hezaran kes bicivin û banga aştiyê bigihînin raya giştî ya cîhanê.

Di vê navê de helwesta hinek rêxistinên çepgir a li hemberî vê çalakiyê hêjayî nîqaş û nirxandî ye. Hinekan ji wan helwesteke klasîk nîşan dan û dan zanîn ku aştîxwazî reformîstî ye. Hinekan jî bi hestên kemalîst nêzîkî di çalakiyê dan û ev çalakî wekî "Trêna Sevrê" bi nav kirin. Di vê warî de helwesta ku herî zehf dilê şerxwazan xweş kir, helwesta Partiya Karkeran (ÎP) bû. Lewre jî çapemeniya ku serokê vê partiyê Doğu Perinçek wekî faş û ji rêderketî bi nav dikirin, bi berfirehî cih dan daxuyaniya Cîgirê Serokê ÎP'ê Bedri Gültekin. Li ser vê helwestê, me jî çend pirs arasteyî Gültekin kirin. Gültekin bi daxuyaniyên xwe em hê zêdetir şaş û metel hiştin. Lewre wî, hemû bûyerê li gorî dilê xwe şîrove dikirin. Li gorî wî çepgirên tirk bi hemû şiyana xwe alîkariya tevgera kurd dikin. Wekî ku ev 15 sal in şer nadome, dida zanîn ku kêşeya kurd wê bi destê wan çareser bibe. Lê di daxuyaniya Gültekin de tiştê balkêş ev e ku ew Perinçek derewîn derdixe, û dibêje di warê kêşeya kurd de artêş ji rayedarên dewletê yên din cudatir nafikirin.

### Rakirina OHAL'ê amedehiya aştiyê ye

Di nav kesên ku me dîtinên wan standin de bi tenê şêwirmendê MÎT'ê yê berê Mahir Kaynak wekî berê menzarayeke çakbîn (iyimser) pêşkêş kir. Lê heta niha çi wexta ku di vî warî de kê serî li Kaynak daye, her tim wî menzereyeke bi vî rengî pêşkêş kiriye, sed heyf û mixabin ku tu pêşdîtinên wî rast derneketine.

Îcar jî Mahir Kaynak piştî ku ji bo "Trêna Aştiyê" piştgiriya xwe ragihand, wiha got:" Hewlên rakirina OHAL'ê û sîstema cerdevaniyê amadehiyên aştiyê ne. Lê, dewlet dixwaze bi şêweyekî sergirtî vê yekê pêk bîne. Ji ber vê yekê nexwaze Trêna Aştiyê zêde derkeve pêş."

Li aliyê din der barê heman mijarê de rewşenbîrê kurd Tarik Ziya Ekincî da zanîn ku desthilatdarên Tirkiyeyê aştiyê naxwazin û hê zêdetir şer teşwîk dikin. Ekincî bal kişand ser lobiya şer û wiha axivî: "Dewlet ji her hêlê ve ketiye bin kontrola lobiya şer." Ekinci di warê rakirina OHAL û sîstema cerdevaniyê de jî bal kişand ser Qanûna Rêveberiya Bajaran û daxuyand ku bi vê qanûnê kontrola leşker û polîsan domdar dibe. Ekinci li ser pirseke me da zanîn ku, Ecevit li ser xeta sosyalîzma nasyonal dimeşe û xeta wî faşîzm e.

Tarik Ziya Ekinci ji bo helwesta ÎP'ê jî diyar kir ku ev partî di nav eniya aştînexwazan de cih digire. Prof. Dr. Mahir Kaynak jî nirxandineke bi vî rengî kir û wiha peyivî: "ÎP'ê di destpêkê de xwest xwe nêzikî tevgera kurd bike, lê piştî ku tevgera kurd rû nedayê, derbasî aliyê din bû."

Li aliyê din serdana Konsolosê Amerîkayê yê Stenbolê bo HADEP'ê bal kişand ser xwe. Konsolosê Amerîkayê jî ji bo Trêna Aştiyê piştgiriya xwe ragihand û da zanîn ku ewê jî here perginiya trenê. Ev yek bi taybetî jî aliyê çepgirên tirk yên radikal ve hate rexnekirin. Lê, Mahir Kaynak wekî bersiva pirsa me, li ser helwesta Amerîkayê ev nirxandin kir: "Hin kes dibêjin PKK bi serê xwe ne xwedî hêz e. Ji ber ku hêzên derveyî piştgiriya wê dikin li ser piyan dimîne, ev ne nirxandineke rast e. Li Tirkiyeyê kêşeya kurd heye." Prof. Kaynak piştre jî da zanîn ku ew helwesta DYA'ê baş nabîne, lewre ew durûtiyê dike. Der barê heman babetê de T. Ziya Ekincî got ku divê teoriyên li ser împeryalîzmê ji nû ve ji ber çavan re bên derbaskirin.

Li aliyên din Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di bernameyeke MED–TV'yê de ev helwesta ÎP'ê bi zimanekî tûj rexne kir û da zanîn ku ew ketiye milên faşîstan. Öcalan li ser helwesta dewleta tirk jî ev nirxandin kir: "Dewleteke ku ev qas kesên navdar




www.arsivakurdi.org

# Nirxandina rewşenbîran di wateyên îroyîn de



*Çîna bijartî, ku bi navê rewşenbîrî têne naskirin çima li ser erda şemîtokî dimeşin? Heger b wan nayê bila dest ji bidûvketina nivîskarên biyanî bernedin û melaqiyên xwe bidomînin. Heger baweriya wan bi komên xelkê kurd heye, divê ku li hemberî her zor û cenderê dengê xwe hildin û li pêşerojên gelê kurd xwedî derkevin.*

MEDENÎ FERHO

*Cahit: Tew mala minê, rewşenbîr...*
*Rewşenbîrên kurdan navnîşana bêzariyê ne...*

*Faysal: Tu dikarî bibêjî tune ne, mîna pepeqonkan, zû diteqin namînin.. Nîn in!..*

*Ejder: Kesên hêja jî hene...Gelê kurd ji vê hêlê ve ne ewqasî bêdunde ye... Lê ji derdê hinekan êdî kezeba me reş bûye.*

*Mazhar: Rewşenbîrên kurd, qels û misriyê mêjiyê xwe ne..*


*Cahît: Haya wan ji cîhanê tune ye...*

Ev diyalog berî bi çendekî li MED–TV di salona dawî ya jor, çayxanê de çêbû. Helbet guftûgoyek dûvdirêj û axaftinên vekirî bi nirx bû. Carcaran nav jî dihatên masêtê... Dil dixwest ku bi giştî hatibûna girtin û tev di rojnameyê de hatibûna weşandin. Wê kêlîkê derfet nebûn. Mijar bi axaftina Faysal Dağlı vebû, ku nivîsandinek li ser rewşenbîran nivîsiye û pêwistî heye ku bi giştî gengeşiyek dûr û dirêj bête kirin, da ku nakokiya navbera hêzan, komiçkan û kesan bi firehî bê axaftin û her tişt ayan bibe, derkeve holê. Kî çi ye, çi dike, cihê kê li ku derê heye, komên xelkê kurd çiqasî xwedî rêzanên pirbêj û hişmend in. Ev kesên ku xwe didine pêş û navê rêzanî û serdariya pêşerojan li xwe dikin, çiqasî xwedî hêza hewngîrî (ramangîrî) ne, heya îro çi dane, ji îro pê de dikarin çi bidin. Yan jî, ew mirovên ku daxwaza payeberziyê dikin, di rewşa îroyîn de ku gelê kurd ketiye nava guhartineke mezin, bûye xwediyê bazareke nirxdar ku di CNN'ê de dibe dabaş û mijara pirs û bersivên weşanan, her wiha di ode û dîwanên nependî de dibine mijara serdarên ku daxwaza yek rêveberiyê dikin çi rolê dilizîn. Guman tê de nîn e ku di guhartinên kom û gelan de rola herî mezin ya rewşenbîran e. Dîroka cîhanê çavdêriya vê yekê kiriye û pêwistiya dubare kirine tune ye. Prensîbek ji ya tevgera mirovaniyê ku ji destpêkê û vir de rola xwe dilîze. Lê yek heye.... Divê ku qet neyê jibîrkirin. Nebesbûna rêzaniya rewşenbîran e... Dema rola komên xelkê di guhartin û nûjeniyê de çênebe, rûmeta mirovan, mafê têgihiştina rastiyê, li hemberî çand û demê bi serbilindî nayê bidestxistin. Di sazkirina pêşerojan de tu pêşengî û çelengiyê nikare bike. Her wiha tîna wî jî nade dermedoran. Heger ev pêk neyê tu hêvî û daxwaz namîne. Em hinekî din vekin û vegerin ser mijara xwe...

Li gorî Ansîklopediya Hemdem ya Laroussê: "Hebûn û xisletên welatekî yan jî koman bi ramangîrî û hunerî ya madî û manewî ku di nava hev û din de hûnandiye bi giştî diyar dibe..." Yanî hebûna şaristanî ku lêxwedî derketinek bi hêz tunebe, mîna şaristaniya berî dîrokê li Afrîka û li Amerîka û li Mezopotamya, dimîne di nava xeşîmên korîşk de. Heger mirovekî lêkolîner kete nava wan xeşîm û nawîskên korîşk û lingê wî di benik, duwelekê aliqî wê bibîne, heger lingê wî nealiqî wê bibûre biçe. Ev rastî, ji hêla rewşenbîrên kurd ve çiqasî tê zanîn, bête zanîn çiqasî li ser tê rawestandin û li gorî rastiya gelê xwe diavêjin. Yan tawanbarkirina Cahît di cihê xwe de ye?

Şaristaniya gelê kurd ku di nava axa Mezopotamya û di nava xeşîm, nawîsk û şikeftên rêzeçiyayên Kurdistanê jêr û jor de winda û hilandi maye, bi kîjan hêz û hişmendiya hemdemî ketiye nava ferhenga qoqê rewşenbîran ku Faysal, tawanbariya bi 'ricimandinek' dojehî wan dike nava kiras û xeftanê bêrûmetiyê? Cihana du cemserî (kutub) ku di nava lerizandinek têr mirin û xwîn de maye, piranî ku her çar hêlên Kurdistanê ji hêla muxlaciyên çavsor û kujer ve hatiye pêçan, hevkêşeya (denge) jîyanê (piranî ya gelê kurd) xera bûye, Faysal çima pêwistiya gotineke wiha bibîne ? Kî û çima ? Sersebebê van tawanbariyan kî ne? Li hemberî êrîş û dijwariyên li ser wan ku dibine malê gîştî, çima dengê xwe dernaxin? Bêdengî mirina jiyanê ye. Ku di sîstema dadgehî de bêdengî bûye 'erê'.... tê ser masetê û ew kesên ku behsa wan tê kirin bi rastî di nava xeftan û kirasên gemarî de pêçayî ne?

Avahiya aborî, cenga mirovan li hemberî xweza û di vê cengê de têkiliyan di nava xwe de radigire. Mirov pêwistî jîndariyê ye ku ji lawiran cudatir e, li hemberî xwezayê serdestî û bandora xwe bi karûbarê xwe yên berhemdarî, ku eê jî girêdayî alav û haletên curbicure û teva ji hêla mirovan ve têne çêkirin. Her wiha ev pêwîstiya rêxistinî dibîne û pêkanî ye. Gelo, wekî Mazhar tîne ziman haya rewşenbîran ji çerx û feleka jiyanê tune ye, yan jî mîna Ejder dibêje hinek kesên bi nirx di nava vê civakê de hene? Dilzariya her du mirovan ji canêşa wan tê. Ji sedî sed ez bawer dikim ku ya dilê her du mirovan nehate ser zimanê wan. Daxwaza wan di se kevçika dilê wan ê têr êş de nehate diyarkirin. Her wiha di nava hoy û mercên cestê xwe de bi kurtî rewşeke bêzarî û têr neçarî danîne meydanê. Faysal, bîr û baweriya xwe di wê nivîsa xwe de anîbû zimen. Ducarî dikir... Mîna Cahît, gelo ew jî ku di rojnamegeriya kurdî de roleke mezin lîstiye û ve rolê xwe berdewam dike, ji êşa dilê xwe ev gotinên giran digotin? "Erêêêêê, erêêêê, vê Ewrûpayê cudik vemirdî çi kir û çi nekir ? Ku hinek dikin û hinek jî dixwin û vedixwin..."



Her şaristanî xwediyê polîtîkeke felsefî û xwediyê hûnandineke polîtîk e. Mixabin,ev felsefe û polîtîkaya şaristaniya kurdî di nava mij û moranek xelcoyî de maye ku xwedî derketina wê bi tenê ji agir û xwînê pêk tê. Her çiqas şaristanî bi agir û xwînê nayên damezrandin jî, mînakên Grekan, Roma, Osmaniyan darî çavan bin jî, rewşa gelê kurd cudahiyekê di nava xwe de dihilgire. Ev cudatî, wekî ku me li jor anî zimên ji muxlaciyên kujer û çavsor tê. Sedem ketiye qonaxa hebûn û nebûnê, bêguman têkçûn û serketinê. Îcar mebesta min ji van peyvan ew e ku çîna bijartî, ku pirbêje û bi navê rewşenbîrî têne naskirin û ew jî xwe rêzanê pêşerojan dibînin, çima li ser erda şemîtokî dimeşin? Baweriya wan bi wan nayê yan bi şoreşê nayê? Heger bi wan nayê bila komên xelkê kurd di şûnê de bihêlin û ji bo nivîskariya wan bête erêkirin û bi payeberzî bête naskirin, bila dest ji bidûvketina nivîskarên biyanî bernedin û melaqiyên xwe bidomînin. Bi rastî êdî xwe di nava kiras û xeftanê kurdîtiyê de nepêçin û bêrûmetiya durûtiyê nekin. Heger baweriya wan bi komên xelkê kurd heye, divê ku li hemberî her zor û cenderê dengê xwe hildin û li pêşerojên gelê kurd xwedî derkevin. Nirxên gelê kurd bi nav bikin, cest û bercest bikin, k bi çav û gav û can bikin. Jîndariya nirxan pîşeya rewşenbîran e. Her çar kesên ku gengeşî li ser çînê bijartî kirine di şîrove û dîtinên xwe de rast bûn. Rastiyek din ew e ku pêwist e ku gengeşî û guftûgoyên li ser rewşenbîran ne di odê, dîwanan de bêne kirin, lê divê ew di rûpelên kovar û rojnameyan de bêne nivîsandin.

Şer, di nava civakên cîhanê de destpêk û pêkanînên tevger û guhartinên bingehîn ên dîrokî ne. Bêguman şerê kurdan a vê demê jî wê rola xwe di v hêlê de bilîze. Careke din dibêjim ku ji ber zor û çetîniya pêgiha demê di deh–pazdeh salên dawî de ferhenga ekolojiya rewşa kurdan di çarçoveya giştî de guheriye û sazkiriya dîrokî hatiye hûnandin. Ya girîng ew e ku ev pêgiha demê bi rûmetî û giranbuhayî bête xilmetkirin. Pîşekariya rewşenbîrên kurd ev e ku xwe ji nava kiras û xeftanê telaqreşiyan, ji nava dudiliyan û melaqiyên genî xelas bikin û bala bidin ser xwe û gelê xwe. Tu rewşenbîrên cîhanê, pêwistiya bin şemsiya rewşenbîrên biyan, pêwistiya binfiskiyên bûrokrasiya kedxweran nedîtiye. Deqdeqiya zendepivî bûye toqê erebî û tirkî ketiye stuwe hinek rewşenbîrokên kurd ku kezeba Ejder reş dikin...

www.arsivakurd.org

# Karî Cengî Cîhanî Yekem le ser Kurdistan

Le diramay mergesatekanî pir derdeserî, barî nahemwarî bo Şerî Cîhanî Yekem le salî 1914-1918 kurd bêbeş nebû, lew asmanî reş û xakî xwênawyey zorbey gelanî bindest eyanbînî be xoyanewe. Kurdî bindestî dewletî osmanî le şerî cîhanî yekema le cengelî zordariya ejya, boye be fermanî dewletî osmanî reş bi girdestî pê kird le lawan û pîran... kê destî go bikat û tifeng bigrê debê bi cengê, yan biyangirtaye û biyan nardaye bo yekê le berekanî şer ke gele zor bûn le zor lawe ceng berpabû nimûney ew berejengiyane weku; Hicaz, Yemen Çanakale, Qers, Mûş û gelêkî tir... Eme way le kurd kird ke duway şerî cîhanî îtir kurd weku hemû netewekanî bindest, zîyatir le xebatî rizgarî bo Kurdistan û serbestî bo netewey kurd berdewam bêt. Netewey kurd destî kird be raperîn û şoreş, dij be dewletanî zordar û dagîrker, îtir dujminî kurd bo serkutkirdinî netewey kurd û lawazkirdinî şoreş û raperinekanyan, destyan kird be pîlan danan, le ber ewey bernameyekî taybetyan rexsand, be tewawî bîryan lewe kird kê debêt Kurdistan bem core nemênêtewe. Boye Îngiliz û iransa kurdistanyan xiste jêr dest be tewawî bo xoyan dabeş kird. Kurdistan bowe tîke tîkey dem gelegorg...

Her le paş tewawbûnî cengî cîhanî kurd gele goranî be ser hat. Kotayî hatinî ceng be şikandinî Almanya, ke dewletî osmanîş xoy be kilkî Almanya ezanî, îtir ewîş lawaz û bê desthelat mayewe. Serkewtuwanî ceng Fransa, Îngîltere, Îtalya, Yunanistan bûn wate (swêndxorekan) we le berwarî 11 mijdarî (sermawêz) 1918 le Wersaîl ko bûnewe û biryarî westandînî cengyan da we mervekanî aştîyan mor kird. Le duway eweş destyan be ser wulatî osmanîda girt, we le naw xoyana kirdyan be çend parçeyekewe, we her le salî 1918 paş morkirinî mercekanî aştî, peymanî Mondurus yan be dewletî osmanî mor kird, kewa sopay osmanî çek dabnê we sopayeke bilawe bîken, îtir dewletî osmanî ke tenha Stenbolî be destewe mabû, naçar bû ke ser bo bendekanî ew peymane danewênê, çunke dewletî osmanî be dest dagîrkeraniyewe lawaz bûbû ke way lê hatun Stenbol be cê bihêlin, Ataturk xoy geyande baweşî kurdekan û be gurg bazî û rêwî telek, kewte giftûgo le gel kurdekan we be kurdekan eygot: "Eme niştîmanî turk û kurd e, ebêt le çingî osmanî û bêgane rizgar bikeyn." Duway ke kune mişkî lê bibû be qeyserî...

We kurdî helxeletaw be bawer û hezî tewawe le gel Ataturk berhingarî dujminekanayan ebûnewe, guwêyan nedayewe berdewambûn le helsandinî şoreş. Lem şoreşê da hêzî kurd le nawçey Mêrdîn, Riha, Dîlûk (Antep), Gurgum (Maraş) hêzekanî Fransa, Yunanistan û îtalya şêwand û şikandiyanin. Wulate hawpeymanekan boyan derkewt ke berjewendiyan le kizbuneya desthelatî bizûtneweş tabê ziyad ebê, we hezî Ataturk baştir çêy xoy egrê, îtir peymanêkyan dirust kird be nawî peymanî Sevr, le şarî Sevr le nêwan wulate hawkarekan û dewletî osmanî. Ataturk bew xalaney ke le peymaneke da hebû qayil nebû, we carêkî tir Ataturk ruy le Anadol û Kurdistan kird be niyazî ewey ke carekî tir kurd helxeltêne û piştgîrî kurdî dijî dewletanî ke pêy biryarî Sevr biryar bû dewletî osmanî le naw berin, ew piştgîrî kurdî bo xoy misoger kird....

Bo ye Ataturk lem cenge da serkewtinyan be dest hêna û ke tewaw be peymanî Sevr razî nebûn..... Îngiliz kiraye derewe we komarî Turkiya tewaw binaxey best û dewletî be hêzî çespand, îtir duway ewey karbedestanî turk be hêz bûn, we kar û baryan be tewawî girte dest, wurde wurde komarî Turkiya kar û pîşe û baweryan beramber be kurd gora we le salî 1922–1923 tewaw, tewaw deryan xist û pîşanyan da ke nek tenha mafî kurd nadat, belku her danîşî pêyan nanêt û hewlî ewe edat ke biyan tuwênêtewe. Be corêk destyan pê kird her çi gondê be destî kurd nexşa bû kawilyan ekird, her kesê bonî kurd le bihataye helyan, ewasî her çi kesê wuşekî kurdî bigoteye zimanyan ebirî, bem core ziyanêkî zoryan be kurd bexşî ke ta em rojeş berdewam e.

**Serçawekan:**

*1. Kurd û Kurdistan/ Muhamed Emîn Zekî Beg*
*2. Mêjûy ebedî kurdî/ Alaadîn Sûcadî*
*3. Şoreşî Diyarbekir/ Osman Uzeyrî*
*4. Kurtemêjûy Kurd û Kurdistanê/ Aso Germiyanî*
*5. Serhildanî Agirî/ Wergêranî Salah Berwarî*

FERHAN ZÊBARÎ

## Em ji ku hatin ku

OSMAN ÖZÇELİK



– Rojbaş hevalê tixtor !
– Ha, rojbaş bira .
– Ma te xwendina xwe kuta nekir, tu yê kengî li nexweşên me binêrî lo?
–Wele ez parîkî bi derengî ketim, xuya ye ez û tu emê bi hevdu re xwendinê biqedînin. Dibe ku navçeya tu lê bibî qaymeqam, ez jî werim nexweşxaneya wê....
– De inşaleh .

Du xortên, kurd ên unîversîteyê di otobosa belediya Stenbolê de bi hev du re wilo diaxivin.

Wan dizanî di hundirê otobosê de, mirov piçekî ji hevdu dûr bin jî, bi dengê wiha berz axaftin hinekî eyb e. Wan ji qazî (qestî) wisa dikir. Wan dixwest rêwiyên otobosê bi wan bihesin ku ew kurd in.

Du kurdên xwendekarên unîversîteyê ku di bin çengê wan de pirtûkên stûr (qalind) hebûn, bi rûyê xwe yî kurkirî û kincên paqij, dixwestin bidin fêmkirin ku kurd ne tenê 'himal' (barkêş) û pêxwas in. Û kurdên tixtor û qeymeqam jî hene û bêyî ku şerm bikin dikarin li her derê bi kurdî biaxivin. Gelek xortên kurd ên bajarên mezin wiha dikirin. Gava rêwiyên kurd ên di otobosê de, qenc têdigihiştin ku bi kurdî tê axaftin, kenek, kêfxweşiyek li ser rûyê wan belav dibû û êdî nema xwe digirtin û hêdî hêdî xwe nêzîkî xortan dikirin û bi dengekî nizm: "Pismam hûn xelkê ku ne?"

Sohbetekê dest pê dikir. Xort gihiştibûn armanca xwe. Nav û paşnav, navnîşan û (hebûya) telefon dan û standin.

Ji rêwiyan hinekan jî ku dengê peyvên kurdî diket guhên wan, mîna ku birûsk li wan bikeve vediciniqîn. Ditirsiyan û paşê hema di quncika xwe de dimelisîn. Xwêdanekê digirt ser laşê wan. Mîna dizê mirîşkan ku di pînikê de hatibe girtin. Dixwestin gavekê berî gavekê ji otobosê werin xwarê. Ji wan bû her kes bi wan hesiyane û her kes wan nîşanî hevdu didin û dibêjin:"Ev jî, aha ev jî kurd e ! Qenc bala xwe bidinê ev jî kurd e ha! "

Bûyerên wilo ne dûr 25-30 sal berê diqewimîn. (Sih sal , pêncî sal di jîyana gelekî de ne dirêj e ). Di ew salinan de navê welatê me "şark" em jî "şaklî" bûn. Û "Şarklîbûn" sedema xwe biçûk dîtinê bû. Propagandaya dewletê, bi kurdan jî dabû bawerkirin ku, kurdbûn kêmasiyeke gelekî mezin e. Ji ber vê yekê kurdên bajarên mezin, çi himal û çi bazirgan hewl didan xwe bi tirkiyeke paqij biaxivin ku tu kes nizanibe ew "şarklî" ne. Ziman bihata guhartin; dev û poz, simbêl û birû nedihatin guhartin. Ew ji bihatana guhartin, şekl û şemal, zend û bend, bewn û cemal nedihatin guhartin.

Hem teknolojiya "cerrahiya estetik" ne pêşketî bû û hem jî kurd ewqas ne dewlemend bûn ku, mîna Michael Jacksonê ku reşik çarmê rûyê xwe yê reş bi emeliyatê bike spî.

Kurd, di nav kompleseke xwe biçûk dîtinê de digevizîn. Tevkujiya sor û ya spî piştî Lozanê dijwartir bûbû û berdewam bû. Polîtîkaya dewletê bi destê kargerên dewletê dihat meşandin. Sîyasetmedar, hunermend, zanyar û rewşenbîrên komarê di tevkujiya spî de rolek mezin dilîstin.

Di fîlm, şano, roman û kurteçîrokan de, di pêkenînan de "tîp" ên kurd cih digirtin. Bi piranî du tîp hebûn. Yek ji wan cahil, nezan, feqir, bêhiş û belengaz bû. Belê ev tîpa wekî "sadiq" dihat nîşan dayîn. Ew sadiqê xwediyê xwe, sadikê dewletê bû. Navê vî tîpî "kurd memed" bû. Li serê kurd memed alawêre–dalawere çêdibû. Yê ku her tim diçû nobetê ew bû. Tîpê duyemîn jî; diz, derewîn, qeleş û rêbir bû. Teva ku ev herdu tîp, tîpên negetîf bûn jî, dîsa di berhemên hunerî de cîhekî fireh nedigirtin.

Îro rewş hatiyê guhartin.

Pirtirînên ew xortên unîversiteyan ku di otobosên de propanganda kurdî dikirin, piştî ku bûn tixtor û qeymeqam; piştî piçekî bi firehiyê ketin, zimanê xwe ji bîr kirin. Êdî ew kesên ku ji kurdbûna xwe şerm dikirin, xwedîtiyê li xwe dikin. Û ew ne sed in, ne hezar in û ne hezar hezar in.

Nazim Hikmet di sala 1963 an de diçe Havanayê. Havanaya Kubayê. Kubaya Fidel Kastro. Nazim dilketiyê şoreşa Kubayê ye. Şoreya Kuba û biserketina proleterên Kuba Nazim serxweş kiriye. Nazim ji hevalê xwe yê wênevan Abidin Dino re wiha dibêje:

*Tu dikarî wêneyê şabûnê*
*çêbikî Abidin*
*Tu dikarî wêneyê havîna 63'an*
*ya Kubayê çêbikî.*

De ez jî ji wênevanê kurd Fewzî re dibêjim:

*Fewzî, ma tu dikarî*
*Tu dikarî*
*Wêneyê panzdehê Tebaxa*
*Şemzînan çêbikî...*
*Tu dikarî wêneyê*
*Em ji ku hatin ku çêbikî..*

www.arsivakurdi.org

# Ruhê 1'ê Gulanê PKK dide jiyandin

**Li Kurdistanê li kedê xwedî derketin bi şerê neteweyî ve girêdayî ye. Ev şer çiqas were geşkirin, ew qas fikir û ramanên proleteryayê zindî û bi kok bibin. Lewre Tevgera Azadiyê di şerê xwe de vê hêviyê dide hemû mazlûm û bindestên cîhanê, di xebata xwe de pêk tîne û nûjen dike.**



Hemû nirxên mirovahiyê bi civakîbûna mirov dest pê dike, dîrok jî bi me dide nasîn ku tevgerên rizgarî û azadiyê di destpêkê de bi dengekî xurt xwestek û armancên xwe dane xuyakirin. Deng çiqas zirav, zelal, şîrîn û xurt be ew qas mirov li dora xwe civandine.

Xwînxwar çiqas radeya kedxwarî û dizîna nirxên mirovan zêde dikin, ew qas teqîna civakê xurt dibe û dengê wan bilintir dibe. Qêrîna herî bilind û gur, qêrîna mirovan û serhildana civaka di bin çewsandinê de ye.

Di dîrokê de gelek bûyerên li hemberî xwînxwariyê qewimîne, wekî qêrîna kolan ji Romayê, li Nînovayê dengê cotkaran û gundiyan ji Çolmên Erebîstanê, li Çîn, Hindistanê û Mezrabotan. Lê tu deng mîna karkerên Şîkago nehatibû belavkirin li cîhanê.

Yekê Gulanê di sala 1886'an de li Şîkago roja qêrînê, roja ku karkeran zendên xwe vemaltin û destên xwe dan ser çerxa dîrokê û gotin: "Dawî ji xwînmijî û kedxwariyê re, êdî em jî mirov in û em jî dixwazin jiyaneke bi rûmet bijîn." Ev gotinên karkerên Şîkagoyê, bingeha livbaziya wan bû. Bi wan gotinên xwe di dîroka kedê de peleke dîrokî ya nû dane vekirin. Fikir û ramanên wan li ser vê bingehê belav bûn. Li Rûsyayê kewçêr (cotmeh), Li Çînê Rêbendan, li Viyetnamê Gulan û li Kubayê reşemî (sibat)...

Rihê 1'ê gulanê her kes nikare di nava xwe bide jiyandin. Ji ber ku xebat û fedekariyê dixwaze. Ev jî bi bawerî û mirovahiyeke mezin pêk tê. Ew kesên ku nikarin vê yekê di nava xwe da pêk bînin, bes riya bazdanê li pêşiya wan dimîne. Ev bazdan, ji xizka karkeran, ji riya rast û serfiraziyê û ji sosyalîzma zanist tên. Yên mîna Kaoskî, sosyal demokratên Ewrûpa, sosyal şovenên tirk û reformîstên kurd, nikarin di nav şoreşa proleterya de bimînin. 1'ê gulanê di dîroka şoreşgerên proleterya de cihekî giring digire.

Di welatê rojê de rihê 1'ê gulanê di 18'ê gulana 1977'de hate çandin û di 27'ê sermaweza 1978'an de hate vejiyandin û bi hêz bû. Ew rihê ku neyarên kedê dixwestin bidine fetisandin, Tevgera Azadiyê bi hêza xwe ya leşkerî ji jiyana kedê re derfet pêkanî. Lewre li Kurdistanê wê bi hêza xwe boriya hilmê ji keda mirovahiyê re da vekirin. Her livbaziyek gerîla li dijî dagirkerên faşîst û împeryalîstan, bi xwe re tola karkeran hiltîne û hêza wan, yekîtiya wan û ramanên wan nû û xurt dike.

Îro jî di şoreşa Kurdistanê de ew ala karkerên Şîkago hatiye vejiyandin. Şîkago îro Cizîr, Nisêbîn, Amed û her qada ku şoreşgerê Kurdistanê tê de xebat dikin e, li wan deran rihê 1'ê gulanê şîn dibe. Tava 1'ê gulanê Tevgera Azadiyê bi hêza xwe ya şoreşgerî dide çandin, di rih û ramanên mirovatiyê de. Vê tevgera şoreşger ew tov ji bo ku kulîkên xwe veke, bi xwîna proleterê mezîn heval Hakî Karer da avdan. Bi xwîna çar lehengên zîndanê geş kir û bi keleşên zarokên Welatê Rojê li ser Çiyayên Mezopotamya, dergûşa mirovahiyê bilind û bilind kirin û dikin.

Tevgera Azadiyê ji ber ku hêza xwe ji dîroka mirvahiyê digire, ji bo mirovatiyê jî dide şuxulandin û dewlemendkirin.

Rastiyeke dîrokê heye; dîtin û ramanên olekî bin an jî çîneke bin çiqas li ser çîn û gelan be, ew qas ew dîtin û raman zindî û bi hêz dibin. Bi vê rastiyê re Tevgera Azadiyê, bi rista xwe ye wekheviyê û xwedî derketina mirov li keda xwe tê dîtin. Ew bi fikir û armancên proleterya doza aşîtî, azadî wekhevî û serxwebûnê dike.

Vê gavê hêzên împeryalîst jî bilî şer tu rê û derfet ji karkeran re nehiştine. Lewre serokatiya Tevgera Azadiyê dibêje: "Tu mercên asayî yên hilberînê li Kurdistanê nîn in, me jî biryar girt ku ji bo ev merc werin kemilandin pêwist e şerekî rizgarî, neteweyî û azadiyê û civakî were dayîn."

Li Kurdistanê li kedê xwedî derketin bi şerê neteweyî ve girêdayî ye. Ev şer çiqas were geşkirin, ew qas fikir û ramanên proleteryayê zindî û bi kok bibin. Lewre Tevgera Azadiyê di şerê xwe de vê hêviya dide hemû mazlûm û bindestên cîhanê, di xebata xwe de pêk tîne û nûjen dike.

Tevgera Azadiyê girêdana bi rihê 1'ê gulanê ve wisa bi me dide nasîn; bi zanistî kedkirin, bi zanistî şer, bi zanistî rêxistin, bi zanistî çalakî, bi zanistî naskirina dîrokê û bi zanistî jiyîn.Li dervayî vê yekê ne gengaz e ku ne gelê Kurdistanê li keda xwe xwedî derkeve, ne jî karkerên cîhanê dikarin serwertiya xwe bi dest bixin, di pêvajoya me ya îro de xwedî derketin li rihê 1'ê gulanê û pêşxistina hilberînê bi şer gengaz e. Şer ne daxwaza karkeran e. Lê hêzên împeryalîst û paşverû tu derfet nehiştine ji karkerên cîhanê re.


Îro di bin zilm û zordariya hêzên xwînmij de tu hejahî û giringiya keda di karxane de tê rijandin nîn e. Ji ber ku ew ked dikeve xizmeta bûrjuwazî. Keda bi nirx û giranbuha îro bi şerê li hemberî xwînmijan ve xwe îfade dike. Li ser vê babetê serokê neteweyî giranbuhabûna kedê di ve pêvajoyê de wisa diyar dike: "Keda herî giranbuha, keda leşkerî ye." Lewre bi keda leşkerî gengaz e ku mirov hem li hilberîna xwe, hem li karxana xwe, hem li azadiya xwe û hem jî li jiyaneke wekhev xwedîtiyê bike. Mirovê şerekî şoreşgerî dimeşîne, ew mirov mirovekî herî zane ku kedeke herî rast dirijîne ye û yê herî pir li berhêmên xwe xwedî derdikeve ye. Lewre ji bo afirandina civakeke mirovahiyeke nûjen şer dike. Hilberîna herî bi zehmet jî afirandina vê civakê ye. Ev civaka ku ji destpêka mirovatiyê de bûyê xeyal ji mirov re, afirandina vê civakê jî ancax bi ronahiya bîrdoza Tevgera Azadiyê û ramanên serokatiya vê tevgerê gengaz e. Ji ber ku tu raman û birdozî bersivê nadin rewşa 1'ê gulanê û dema me ya îroyîn.

AHMED HUSEYIN



www.arsivakurdi.org

BÛYERINE JI DÎROKÊ



● **30.08.1995:** Li Ewrûpayê Konferansa Jinên Kurd civiya.

● 30.08.1993: Navenda Çanda Mezopotamya, li başûrê Kurdistanê li Hewlerê şaxa xwe vekir.

● 01.09.1939: Şerê Cîhanê yê duyemîn dest pê kir. Piştî şeş salan dîsa di sala 1945'an û di yekê Rezberê (01.09.1946) de qediya. Di vî şerî de nêzîkî deh milyon mirov mirin û bi milyonan jî bê cih û war man. Roja yekê rezberê jî her sal wekî roja aştiyê tê pîrozkirin.

● 01.09.1945: Ho Shî Mînh azadiya Wîetnamê îlan kir.

● 01.09.1969: Muammer Qedafî, li Libyayê şoreş pêk anî.

● 01.09.1987: Sazûmankara Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) Didar Şensoy çû ser dilovaniya xwe.

● 02.09.1983: Li Girtîgeha Leşkerî ye Amedê greva birçîbûnê û berxwedana mezin dest pê kir.

● 02.09.1993: Dr. Zekî Tanrıkulu ji Farqînê ji hêla hizb-î kontrayan ve hate qetilkirin.

● 03.09.1924: Serhildana Elkê (Beytuşebabê) dest pê kir.

● 04.09.1993: Parlementerê kurd Mehmet Sincar û rêveberê DEP'a Batmanê ji hêla kontrayan ve hatin qetilkirin.



# Konferansa Yekemîn a Jinên Kurd




**Di beşa pêşniyazan de jinên kurd bi giştî li ser pirsgirêkên xwe yên malbatî rawestiyan û dan zanîn ku jina kurd nikare ji gotina zilamê xwe derkeve. Ev yek dibe asteng lewre ew nikarin li mafê xwe bigerin.**

Roja 24'ê gelawêja 1997'an Konferansa Yekemîn a Jinên Kurd ji aliyê Komîsyona Navenda Giştî ya HADEP'ê ve li salona konferansê ya HADEP'a Bağcılarê, bi beşdariya 350 jinên ku ji derdorên cuda hatibûn, hate lidarxistin. Berî Konferasa Jinan a Yekemîn du roja dom kir peyam (mesaj) hatin xwendin. Di nav van peyaman de peyameke dûvûdirêj ji Girtîgeha Enqereyê ji aliyê mebûsa kurd Leyla Zana ve hatibû şandin. Piştî xwendina peyaman du rapor hatin xwendin, ji wan raporan, rapora yekemîn ji aliyê Berpirsa Komîsyona Jinan a Navenda Giştî ya HADEP'ê Aynur Gürbüz ve hate xwendin. Rapora duyemîn jî rapora piştgiriyê bû, di vê rapora piştgiriyê de li ser bi rêxistinbûna jinên kurdan û li ser yekîtiya jinên kurd û yên tirk dihate rawestîn. Her wiha nebûna înîsîyatîfa jinan jî wekî kêşeyekê hate destnîşankirin. Di rapora piştgiriyê de li ser rewşa derûnî ya jinên kurd ku ji ber şer û koçberiyê belawela bûne jî hate rawestîn. Ji aliyê sosyalîtiyê ve qels ketin, ji aliyê çandî û hunerî ve pêş neketin û xwe di nav siyasetê de nedîtin jî, di nav pirsgirekên jinên kurd de cih digirtin.


Di beşa pêşniyazan de jinên kurd bi giştî li ser pirsgirêkên xwe yên malbatî rawestiyan û dan zanîn ku jin li malê ne xwedî biryar e û nikare ji gotina zilamê xwe derkeve. Ev yek jî li ber wan dibe asteng lewre ew nikarin li mafê xwe yî jinbûnê bigerin û di çalakiyên wiha de ew bên derd û kulê xwe bibêjin. Jinên kurd diyar dikin ku, ji bo hatina vê konferansê wan hezar derew kirine, ji bo ku zilamên wan li ber hatina wan nebin asteng. Dîsa wan dan xuyankirin ku ew dixwazin di nav siyasetê de polîtîkayê de cih bigrin, di nav xebatên HADEP'ê karibin bi dilekî rihet kar bikin, xwe perwerde bikin, der heqe jinên cîhanê xwedî agahî bin. Ji ber vê yekê ew jî piştgiriya kampanyaya ku HADEP'ê daye destpêkirin "Kadınlar HADEP'e (Jinino werin HADEP'ê)" dikin û hetanî dawiyê çi ji destê wan bê, ewê bikin. Beşdarên konferansê ev nirxandin kirin: "Êdî em bîra gelek tiştan dibin, em têdigihêjin ku nêzîktedayiña zilamên me ji ber bandora polîtîkaya qirêjî ya dewletê ye, windabûna nasnameya me û şexsiyeta me ji ber perçiqandin û zordestiya dewletê ye."

Berî ku konferans bi dawî bê dayikeke kurd ya 65 salî axafinek kir û da zanîn ku barê aştiyê jî li ser pişta jinan e.

NAVENDA NÛÇEYAN

## ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YİĞİT



## Bêhna ku qet teng nabe

Serxet û binxet hê nû çêbûne. Hê bombeyên binerdê nehatine danîn û çûn û hatina di nav Başûrê Biçûk û Bakur de jî kar û mijûlahiyên rojane ne. Sînor hê nebûne sînorên îro. Ew çendî ne asê ne. Di van salan de erebên şemerî û tî û birçî ne. Bakuriyên li ber xetê xistine qelaqê. Her şev û pir caran jî bi rojê dizî û talanê dikin, davêjin ser gund û rêwiyan. Dawiya havînê ye. Payiz li ber derî ye. Sal ji awira xwedîrezan salake bixêr û bêr e. Rez tijî tirî ne, bi ber in. Du xwedîrezên çiyayî berê xwe didin bajêr, dikevin rê. Kerên wan di ber wan de ne, barkirî ne. Barê wan tirî ye. Em bêjin navê wan Berxwedan û Berdîwar in. Di nav sohbetê de Berxwedan ji Berdîwar re dibêje: "Berdîwar, li beriyê nêzîkî sînor ereb dikevin pêşiya xelkê û barê wan ji wan distînin. Wan tazî dikin. Ez dixwazim bînim bîra te, ji bîra neke, bila di bala te de be." Bedîwar lê vedigerîne: "Berxwedan tu xeman mexwe. Ne hewceyî mitale û paxavan e. Ez bavê filankes im. Bila çavên te ziwa bin ji min." Pesnê xwe dide.

Rêwiyên me riya xwe dikudînin. Mişwarekî çend mişwaran bi rê de diçin. Pişta wan dikeve çiyê, derdikevin qeleç û ber bi jêr de kîlometreyan dispêrin hev. Zêdeyî saetekê derbas dibe. Li cîhekî ku xwe di nav sohbetê de berdane û haya wan ji bayê felekê nemaye, pêjnekê dikin. Li ser milê xwe diqulibin. Dîna ku dibînin siwarekî ereb di nav toz û xubarê de horhora wî ye û bi xezeb ber bi wan de tê. Çawa digihe wan, debûzê di destê xwe de dadiweşîne wan û li wan hiltê, dike, qîreqîr. Zehbere û şawşawê li wan radike. Qewimiye, serbiseriyê hatiye û wexta desthilanînê ye. Berdîwarê ku berî bi saetekê pesnê xwe dabû deng û his jê dernakeve. Yê ereb jî her bi debûz û cunehê xwe li wan dide; nabêje ev serî ye, ev dest e, ev filan û bêvan e, raserî wan hatiye û mîna bêje keroreşo te çi xwariye, destê wî radibe û dadikeve. Berxwedan li ber xwe dide. Tiştê ji destên wî tê teqsir nake. Ew jî li vê beriya bê kevir, tiştê dikeve destên wî davêje yê ereb, xwe ji ber derbên cunehê jî dide alî. Ji bo ku di nav lingên hespê wî de nemîne dipeke vir û dera han. Teslîm nabe û di ber re jî tim bangî Berdîwar dike: "Kuro dest hilîne, bila av di te de bigere. Çi bi te hat, tu şerm û fedî nakî. Ka tu mêrê bi sed mêrî bûyî, ka tu mirovê rojên qewamê bûyî. Dest bibe xwe. Îro û neçû rojên din. Kerên me çûn, barên me çûn. Em dê çi bêjin der û ciranan, malbat û kufletên xwe..!!?? "


Berdîwar xwe daye teniştekê û her dibêje: "Hê bêhna min teng nebûye. Ku bêhna min teng bû tu binêr ez dê çi bikim." Dawî yê ereb cil û bincilên Berdîwar jî jê dike û dihêle şilfa sitir û qûnê û herdu keran tevî barê wan jî dide ber sînga hespê xwe û dibe. Berê xwe dide binê beriyê û serberjêr dibe, diçe û ji ber çavan dikeve. Lê hê jî bêhna ciwamêrê me Berdîwar teng nebûye.

Helbet Berxwedan careke din li Berdîwar ewle nabe û ji hevaltiya wî dikeve şikê. Berxwedan tiştekî din jî dike. Ji vê hevaltiyê ji bo xwe hin ders û tecrûbeyan derdixîne. Mirovê ku qet bêhna wî teng nabe, li ber çavên wî giş mal û mewdanê wî nehîb dibe û dawî kincên wî heta bi derpiyê wî jî jê tê standin û cardî jî di eynê xwe re dernaxe, mirovekî bêxîret e. Hevaltiya bi mirovên wiha re jî mirov lekedar dike û dike şirîkê nekirkêrî û nêtiştikiyê. Bêhna ku qet teng nebe, divê mirov şikê jê bike.

Gelek siyasî û rêxistinên me jî dişibin Berdîwarê vê serpêhatiyê û ew jî bêhna wan qet teng nabe. Tu dibêjî: "Kongreya Neteweyî", ew dibêjin: "Ne wext e, hê bêhna me teng nebûye." Tu dibêjî: "Yekîtî", ew her gotinên xwe dikin: "Zû ye bila bêhna me teng bibe." Piştî ewqas derengî û ewqas tiştên hatine serê Kurdistanê heger bêhne van ciwamêran hê jî teng nebûbe, divê belayek hetibe serê vê bêhnê û ev ne bêhneke normal be. Cardî divê bê gotin: Baş e û mîna kurd dibêjin "Mala xwedê ava ku pekeke heye."



www.arsivakurdi.org



# Karîkatûrîstê

# Huner helwe

*Birêz Salayî, naskirina we û xêzan çawa dest pê kir?*

● Ez ji biçûkiya xwe heta îro resiman çêdikim, xêz û skêçan diafirînim. Divê ez bibêjim ku birayê minê ê mezin, hem çîroknivîs e, hem peykertaşekî bi nav û deng e, perwerdehiya xwe jî, li Zanîngeha Silêmaniyê li "Beşa Hunerên Bedew" kuta kiriye. Navê wî Muntasam Salayî ye. Bêguman, bandora wî li ser min û hunera min gelek çêbûye. Ew li tevahiya başûrê Kurdistanê tê naskirin. Li Başûr xêz çêdikirin. Ez jî girêdahiyê wî bûm. Di biçûkahiya xwe de jî, jixwe min gelek hez ji xêzan dikir. Li dibistana seretayî, dewlet ji bo ku resim û xêz bên çêkirin, defterên (lênûsk) resim bêpere didana me ji bo çend mehan, lê ew defter–resim ji bo min kêm bûn, tune bûn, ji ber ku min di çend rojan de ew tijî dikirin. Piştre ji ber ku têrê nedikirin, min li ser defterên dersên kurdî, matematik, erebî, fizîk û hwd. resim çêdikirin, bi tenê ji ber vê yekê, tevî ku ez xwendekarekî jîrek bûm jî, min ji mamosteyan lêdan dixwar.

*Hûn di xêzên xwe de dixwazin mesajeke çawa bidin gel?*

● Berî her tiştî ez wekî hunermedekî piralî xebatê dikim. Lê tu dikarî bibêjî ku, karîkatûr cara yekemîn li Başûr bi destê min hate çêkirin. Di sala 1990'î de li Baxdayê ji bo karîkatûrîstên Iraqî pêşangehek li dar ket. Ez bi tenê wekî kurd beşdarî vê pêşbaziyê bûm. Di encama pêşangehê de ez bûme duyemîn.

*Li ser navê kurdan ?*

● Belê belê! Li ser navê kurdan. Bi tenê ez kurd bûm. Heta li ser xelatê jî bi erebî wiha hatibû nivîsîn: "Li her bajarî 10-15 hunermend beşdar bûne, lê li tevahiya Kurdistanê hunermendekî kurd beşdar bûye û ew jî bûye duyemîn, lewre em wî piroz dikin." Wekî tablo ji min gelek pêşangeh vekirine. Li nav tevahiya Iraqê û li Kurdistanê û li gelek welatên wekî Qeneda, Kuweyt, Bahreyn, Îtalya, Almanya pêşangehên min çêbûne. Cara dawî, îsal di meha avrêlê de li Stenbolê li Navenda Çanda Mezopotamya yê min pêşangeh vekir.

Ez dixwazim beriya her tiştî bibêjim ku dîrokeke pir mezin û girîng heye, folklor û rewşenbîriyeke mezin heye. Peyam û mesaja min ew e ku, divê gelê kurd hunerên kurdî nas bikin, ez bi xwe dîrok û mêjuya kurdan nas dikim. Der heqê folklora kurdan de dixwazim têkiliyeke nû çêbikim. Lewre jî, dema tu dêhn û bala xwe bidî tabloyên min tuyê bingehekę zanistî bibînî. Bi riya hunera xwe ez dixwazim behsa gelê xwe bikim. Mesaja min ya herî dirust û rast jî ev e.

*Gelo hûn dikarin çi navî li hunera xwe bikin?*

● Fikr û hizra mirov roj bi roj diguhere. Hunermend îro di bin bandora tiştekî de ye, sibê dikeve bin bandora tiştekî din. Pir ji hevcûdabûn derdikevin holê. Roja ku ez di bin kîjan barîdoxê (rewş) de bim, wê rojê tu dibînî ku ez der barê wê rewşê de tabloyek çêdikim.

> Li bakurê Kurdistanê, wekî em dibînin nûjeniyek heye. Berê bi çend salan kurdên Bakur, di nava xewneke giran de bûn. Lê niha bi awayekî zêde xurt rabûne. Tiştê ku zêde bala min kişandiye dîsîplîna hêza Bakur e. Tevgera bakurê Kurdistanê zêde zanistiyane ye. Heger ez şoreşa başûr û bakurê Kurdistanê bidim berhev, wê gavê dibînim ku berhemên vê şoreşê zehf zêde û hêja ne.

Eger tablo çêbû, ew zêde baş e, eger çênebû wê gavê dest bi karîkatûrekî dikim. Lewre zimanê karîkatûr û zimanê tabloyan ji hev cuda ne. Resamê navdar Pablo Picasso li gel pirsekê wiha dibêje: "Ez nikarim bibêjim ku ez girêdahiyê rêbazekê an sembolekê me" Na, ne wisa ye, ez li dijî vê gotina Picasso me, divê her tiştek, dîrokek, sembolek ji bo min bibe îlhamek , ez wê yekê bi awayekî nûjen di xêzên xwe de pêşkêş dikim.

*Kijan hunermendên cîhanî li we bandor kirine?*

● Ez hez ji wan hunermendan dikim ku, dixwazin nava dilê xwe diyar bikin, behsa xwe bikin.Wan Gogh, Pablo Picasso, hunermendên şoreşvanên meksîkî, wekî Rêwîêra û Sikiroz, ez dikarim bibêjim ku bandora wan li ser min heye. Lê ramanên min bi awayekî kurdane ne. Yanî bandora wan di ramana min de mîna mirovekî kurd, ku em dibînin rewşa kurdan çawane, li ser min heye. Hunera kurdan û dîroka kurdan bi hunera min ve girêdahî ye. Wexta ez berhemekê derdixim, ez dikarim bibêjim ku berhemeke taybet e, ne teqlîd kirine, ne girêdahiyê rêbazekê (ekol) biyanî ye jî. Rêbazeke min a bi xwe heye, lê bandora rêbazên biyan jî li ser min heye

*Di karîkatûrên xwe de hûn qet cih nadin nivîsê, gelo sedemeke vê ya taybet heye?*

● Huner bi awayekî giştî xwediyê zimanekî cîhanî ye. Em li vê derê mesela guhdariya Elvis Presley, Micheal Jackson û guhdariya muzîka Şopen, Bach û Mozart dikin, tevî ku em ji zimanê wan fêm nakin. Karîkatûr bi xwe ji du cureyan pêk tê; karîkatûrê bêxeber û karîkatûrê bi xeber. karîkatûrên ku xeber tê de hene, bi rastî zêde ne cîhanî ne. Çawa ku em bibêjin, navxweyî ne. Ji ber ku kesekî biyan nikare jê fêhm bike. Karîkatûr çiqas peyv tê de kêm bin, ew qas baş e. Ji ber ku tiştên dîtbarî şîrovekirinê nexwazin. Wê çaxê mirovekî fransî, almanî an jî mirovekî ereb dikare berê xwe bidine karîkatûrê û fêm bikin ka çi dibêje. Niha jî di cîhanê de, ewên zêde bi zehmet û giran karîkatûrên bêpeyv in.

*Li başûrê Kurdistanê bi giştî rewşa hunerî, bi taybetî jî rewşa karîkatûr û wênesaziyê çawa ye ?*

● Wexta tu behsa rewşa huner a li Başûr dikî, rewş ne wekî berê ye. Bi awayekî giştî rewşa hunerê gelekî pêşketî ye. Bi taybetî rewşa hunerê, li başûrê Kurdistan digel rewşa bakur û rojhilata Kurdistan gelekî pêşketîtir e. Lê niha ji ber barê ekonomî û siyasî ya xerab, li Başûr bandoreke ne baş li ser gel heye. Îro karê hunermendî yê herî mezin, peydakirina nanekê ji bo zarokê xwe ye. Niha huner di başûrê Kurdistanê de nexweş ketiye. Ez nabêjim miriye, ji ber ku niha jî huner heye. Semîner, rojnamegerî, şevên helbest xwendinê, pêşangehên hunerî têne lidarxistin. Ji aliyê hunera tablo çêkirinê de, Iraq welatekî pêşketi ye. Bandora wê jî li seranserê Kurdistanê heye. Hunermendên kurd jî, dikaribûn wekî hunermendên Iraqî bêne nasandin. Beriya niha jî, kurdan gelek pêşangeh li Parîs û şarên (bajar) welatên biyan vekirine û vedikin. Li Silêmanî, Dihok û Hewlerê jî Peymangehên Hunerên Bedew hene. Bi sedan xwendevanên kurd, li van deran dersên hunerî dixwînin. Hunermendên mezin yên kurd

## Muhemed Salayî kî ye?

Di sala 1962'yan de, li bajarê Kerkûkê hatiye dinyayê. Li Başûrê Kurdistanê û li gelek welatên Ewropayê Pêşangeh vekirine. Di sala 1990'î de li Bexdayê, di festivalekê karikatûrê de xelata duwemînî wergirtiye. Di sala 1993'an de yekemin filmê kartonê yê kurdî bi navê "Kurdo" çêkiriye. Ev xebat ji aliyê UNESCO'yê ve hatiye tescîlkirin. Di gelek rojname û kovarên kurdî de xebitiye. Endamê "Desteyî Balayî Komala Hunermendê Kurdistan" û "Yekitiya Niviskarên kurd " e. Xwendina xwe li Zaningeha Salaheddîn, li Bajarê Hewlerê kuta kiriye.

# Hîn hinek ruh di min de maye

### xewneke serjêkirî

*Rêwiyo*
*eger tu hatî*
*te termê çivîkekê dît*
*hîn germ e*
*te kulîlkek yan nêrgizek qurmiçî*
*di şopa cizmeyan de dît*
*te zarokekî bêdest û serî*
*li ber derê dibistanekê dît*
*te xewneke serjêkirî*
*di çavên keçekê de*
*li quncê kolaneke min dît*
*nebêje dijmin çi hov e*
*rêwiyo*
*ev ne karê dijmin e*
*ev mêraniya zarokên min e !!*

### Pêşangeha Tabloyên du rengî

*Werin*
*hîn hinek ruh di min de maye*
*ji min bistînin*
*bi nêvî bikin bedena min ya ji axeke hogirî*
*talanan bûye....*

*Beşekî bidin Soran*
*yekî bidin Behdinan*
*werin-*
*hîn çend bost axa min ya ne lewitî maye*
*bi cizmeyên xwe yên termên gulên Newrozan*
*bi wan ve.... bilewitînin*

*Bihara min a sêwî*
*Kelogirî ji dîlana kulîlkan bi kişkişînin*
*laşê min yê ku tiliyên enfalan nexşeyê*
*zeviyekî beyar li ser çêkiribûn*
*bi gîsinên kîna xwe cot bikin.*

*Fermo... de werin*
*bi çek û rextên xwe*
*bi şal û şapikên xwe*
*bi mêraniya xwe*
*û bi girrê di dilê xwe de werin*



*Ez Helebçe me*
*hin bîna xerdelê ji nêrgizên min tê*
*hin sirûdên şîna min a yekem*
*li ser lêvên helbestvanan e*
*hin pere û dirav ji bo*
*zarokên min yên rû pizik tên civandin*

*Ez Helepçe me... Helepça we me*
*delala dilê we me*
*xemla stranên we me*
*hêsra çavê dîroka we me*
*nalîna bilûrên we me*
*werin...temaşeyê..*
*evê weke dêwekî xuya dike*
*çiyayê pîremegrûn e*
*por spî kiriye hingî ba*
*sirûdên xwe yên xemgîn di guhê wî de bihûne.*

*werin temaşeyê*
*bi tiving û topên xwe*
*bi çavên xwe yên ne kurd*
*bi rengên xwe yê cuda*
*pêşangeha tabloyên du rengî me ez*
*caw ji xwîn e*
*çarçov ji êgir*
*û reng*
*aaax reng !!*
*we kê dîtiye rengan şer kiriye !!*

*Ez Helepçe me*
*biharê çavên min bi sosinan kil dikirin*
*çiya...dawa min tijî kanî dikirin*
*stêrik dibûne gulbend di gerdana min de*
*zivistanê her sibe wekî zarokekî*
*rûyê min dişûşt*
*di hemêza havînan de radizam*
*lê xewnên min.. tev de bihar bûn*
*payîz li ber ciwaniya min lal dibû*
*her êvar kaniyan çîrokên xwe yên avî*
*bêdeng ji min re digotin*
*û roj... her sibe dihat*
*wekî evîndarekî netirs, li ber çavên her bajarî*
*lêvên min radimûsan*
*Goran... ez bi helbestên xwe dilorandim.*

*Cîranan kirasê min ji min kirin*
*hibriya min dizîn*
*xavika min revandin*
*hûçikên min şewitandin*
*lê zarokên min*
*(waaax li min bêxwediyê) da ku zanibin*
*laşê min keske yan zer e*
*derpî ji ji min kirin.*

JAN DOST

---

# Ez mêvan im li her derê

*Ku tu bipirsî, wê bibêjin ji te re, av û agir*
*Bê çawa xwe dikuje li vir mirov*
*Û çawa tê terikandin welatek.....*

*Ezê sitara xwe di hembêza kîjan keçikê de bibînim*
*Niza, kîjan bajar dikare hilgire vî barê min*
*Û ez karim barê kîjan evînê hilgirim gelo?*

*Tim ev bû, fikara min û hemû sal*
*Weha derbas bûn û çûn...*

*Ez yek bi yek hatim kuştim, kesek nema*
*Kesek nema, ku li ser min bigirî jî êdî*
*Jixwe dûr e diya min û*
*Di nav xeyalan de ye rûyê*
*Wê keçika ku min hez kirî..*
*Û jixwe ez nizanim, ez li ku me niha..*

*Ji ber vê, ez mêvan im li her derê*
*Û ji ber vê revok...*

*Hew tê, sewta dilê min û stranên min giş nivco man*
*Tu bajar, nikarin barê min hilgirin êdî*
*Ku ez jî bigirîm, wê bieşe dilê diya min û her*
*Wê li ser riyekê, baskên xwe bişkînin li vir*
*Hemû çivîkên ku hatine terikandin*

*Ku ez jî bigirîm, wê binalin gerîllayên reqsok*
*Û wê xwe bixeniqînin dîsa yên mîna Mazlûm*

*Ku ez jî bigirîm, kes namîne ku bikene li vir*
*Û ji bo ramûsanek te bi şevan hişyar bîmine*

*Ku ez jî bigirîm, wê xwe ji nû ve bişewitînin*
*Ew kulîlkên delal, li ser bircan..*
*Û wê reşa xwe girêde dîsa Diyarbekîr*

*Dilê min, diricife, diqefilim*
*Ku ez negirîm... ezê xwe bikujim...*

*Ku ez negirîm, ezê xwe bikujim êdî*
*Û, ku ez xwe nekujim jî... ezê herim ji vir*
*Nikarim, nikarim,*
*Wê bêriya min bikin hemû kolanên Diyarbekir*

*Ku ez jî herim, kes namîne ku bikene li vir êdî*
*Û wê baskên xwe bişkînin*
*Hemû çivîkên ku hatine terikandin.*

ÎBRAHIM AYDOĞAN
*19 Gelawêj-1997*



www.arsivakurd.org

# Dûrikên dawetan

Dûrikên dawetan, dema bûkê derdixin an siwar dikin, li welatê me bi taybetî dema bûk li hespan siwar dikirin, ew dûrik dihatin gotin. Dûrik li her deverê cihê cihê ne.

Wekî ku tê zanîn wêjeya kurdî di vî warî de jî bi devkî maye û pir hindik hatiye nivîsandin. Di vî warî de mirovan rexneyên xwe, pesnên xwe, kêmasî û dewlemendiyên xwe anîne zimên. Di dûrikan de carinan mirov dinihêre ku pesnê bûkê, yê zava, yê bavê zavê, bavê bûkê, diya bûkê û diya zavê hatiye dayîn. Carinan bi awayekî tund, carinan bi awayekî nazik, carinan rewşa malbatê, carinan rewşa civakê bi dûrikan hatiye rexnekirin. Wekî çawa di dengbêjiyê de rewşa civakan an ya şexsan hatiyê zimên, di vê babetê de jî mirovan rewşa xwe anîne zimên û ne bi awayekî dizî, bi awayekî eşkere ku her kes bibihîze kul, êş û elemên xwe diyar kirine.

Ev mînakên dûrikan ku me li jêr rêz kirine, ez bawer im ku wê hîn baş bidin fêmkirin. Emê hinekî li ser van dûrikên ku li devera Şemrex (Mazîdax), Dêrikê û Mêrdînê hatine gotin, bisekinin.

Heke dema xwestina bûkê, bavê wê astengî derxistibe û bêyî dilê xwe qîza xwe dabe û bi çûyîna qîza xwe pir xemgîn be, ji aliyê berbûyan ve wiha hatiye rexnekirin:

*Bavê bûkê qurmê de hişk o*
*Di quncîkêd fişke fişk o*
*Wele yadê*
*Kes tune ye poz paqiş ko*

Heke qîzekê ji birayê xwe pir hez kiribe, dema birayê wê dibe zava pesnê wî dide:

*Çi bîra binî kûr o*
*Tê de yî masiyê hûro hûro*
*Wele yadê kekê min*
*Him axa ye, him midûr o*

Heke malbata zavê ji mala bûkê razî be, dixwaze kêfxweşiya xwe diyar bike jî wiha hatiye gotin di dûrikan de.

*Çi xanîkî nuh lêkirî*
*Derî pencere berjêr vekirî*
*Navê bûkê Şêrîn e*
*Ji me re tê de xwedî kirî*

Di vê dûrika jêr de jî bav û diya bûkê qîza xwe rexne dikin ji ber ku xatir nexwestiye:

*Erdê me jî, erdê we jî*
*Me tê de çandibû nokên bejî*
*Bûka me sibê rabû*
*Negot bavo yadê bi xatirê we jî.*

Carinan jî rexnekirina edetan jî di dûrikan de xuya dibe û wekî "Dinyanedîtî" yê tê bilêvkirin. Li aliyekî jî siûda qîzan ya xerab tê zimên:

*Hatin hatin, hatin hatin*
*Pêşiyê ereb in, dawiyê tat in*
*Qîzê vî zemanî*
*Wek rêncberê qewl hilat in*

Me got ku di dûrikan de carinan rewşa civakê jî tê zimên. Têkiliya hin dûrikên bi dawetê re tune be jî ji bo ku hin kes bibihîzin an kêfxweşiya xwe bînin zimên, an jî wekî bûyerekê pîroz bikin di dawetan de bi dûrikî tê gotin. Ev mînakên li jêr vê yekê didin xuyakirin:

*Ha li liba, ha liba*
*Nexşê hûr e rû heqîba*
*Şervanê bavê lezgîn*
*Ketiya Metîna*

*Çavên te çavê şehînan*
*Biskê te dirêj e*
*Mîna qancokê dor mihînan*
*Şervanê bavê Newalê*
*Ketiye dora metînan*



Hevalên bûkê jî dixwazin bûk bigihêje mirazê xwe, lê parîkî ne bi dilê dê û bavê be jî wiha hatiye gotin:

*Me hevalîka xwe bi rastê xist*
*Xêlîka xwe bi ber bayê xist*
*Me agir bi dilê dê û bavê xist*

Li aliyekî jî xesîsî û temakariya bavê bûkê tê rexnekirin:

*Bavê bûkê pir xesîs e*
*Pere berda binê kîs e*
*Wele yadê hevalka min derxist*
*Bêcil û bêcihîz e*

Carinan jî ne bavê bûkê bi tenê diya bûkê hatiye rexnekirin:

*Bavê bûkê çû zozanan*
*Anî hirîka berana*
*Diya bûkê xerab bû*
*Jê re nekir tûrê bêrîvana*

Carinan jî mirov dibîne ku hevalên bûkê ji bo bibin alîkarê sebra wê û dilê wê xweş bikin wiha gotine.

*Xêliya hevalan dezî dezî*
*Tê re xuya ye bisk û kezî*
*Lê lê xwazî xema neke*
*Way berbû tên bi lez û bezî*

Û daxwazên bûkê ji divê dûrikê de tên eşkerekirin:

*Hewşa der newal e*
*Xwe jê berda xezal e*
*Eyûnê rû bi xirxal e*
*Dil ketiye kurxal e.*

Carinan jî hin berbû li ser xwe an li ser mêrê xwe yan jî li ser lêzimên xwe dûrikan dibêjin, an jî didin naskirin:

*Rêka Mêrdîn xwaro maro*
*Jê derket cotek karo*
*Siwarê pêşiya bavê Şevîn*
*Şewqe xwar o*

Li ser mal û dewlemendî û xizaniya maliyên bûk û zavê jî gelek dûrik hatine gotin:

*Çi sindoqa çingî vala*
*Şewqê da kaş û newala*
*Lê lê xwakê te negot*
*Ev sindoqa her nav şirîk û hevala*

*Ha li kela, ha li kela*
*Koç û keriya de mexela*
*Tu qîza feqîra bû*
*Tu bû bûka axalera*

Carinan xwediyê bûkê dixwazin ku bi hinekan bide fêmkirin ku ev bûk bi xwesteka wan e. Wekî:

*Hewşa me di hewşa we de*
*Darê hewşê di qubê de*
*Me dixwest û dilê me tê de*

Li ser helwesta lêzimên bûkê jî dûrik hatine gotin:

*Defa me defa heyatê*
*Def giran e bi teqla tê*
*Xalê bûkê ne tiştek e*
*Ji me dixwaze davanca xelatê*

Hevala bûkê xwestiye tiştekî jê re bikire û bi kêf û dilxweşî li nava dawetê an dema bûk siwarkirinê wiha gotiye:

*Qerejdaxe bûye ewro*
*Li Dêrikê derketiye*
*Desmalê tewl bi tewlo*
*Ezê yekê bikirim*
*Ji hevala xwe re eniya zêra*
*Eniya gewr o*

Deme ku berbû nû têne ber deriyê malbata bûkê, di wê xirecirê de ku herkes dixwaze bûk zû derkeve û şahî bilind dibe, ew rewşa jî wiha hatiye zimên di dûrikan de:

*Hatin hatin, hatin teyo*
*Bike kar û barê xwe yo*
*Lê, lê Nergîz de zû rabe*
*Dem û wexta me tune yo*

Ev mînakên dûrikan dibe ku ji hin kesan re wekî "manî" yê tirkan jî be. Lê belê yên ku tên dawet kirin, bi taybetî yê gundan û li wan guhdarî kiribin, wê cihêbûna wan zanibin. Dema dawiya dawetan û bûk derdikeve an tê ber mala zavê, ev dûrik tên gotin. Dema têne gotin ew awaz û melodî ya xweş mirov dibê dinyayeke din. Ne mimkûn e ku mirov kêfxweş nebe. Jinên kurd bi awayekî hunerî peyvan ji hev dihûnin û êş û kulên xwe bi vî awayî derdixin der. Emê gotinên wan jî li gorî zanîna xwe hinekî rave bikin.

Dema dûrik tên gotin, carinan hevok an rêzik (mısra) di nêvî de tê birîn û bi rêzika din dibe yek, carinan jî hevokek bi tenê dibe awazek. Carinan jî hevok jî bi du cîhan dibin û bi ser hevokên din an rêzikên din têne gotin. Mînak:

*Defa me de/ fa heyatê*
*Def giran e/ bi teqla tê*
*Xalê bûkê / ne tiştek e*
*Ji me dixwaze devan/ ça xelatê*

Wekî me di serî de jî gotibû, dûrik li welatê me di dawetan de pir têne gotin. Lê belê aniha wekî demên berê nayên gotin. Wan jî ji pişaftinê (asîmîlasyan) para xwe girtiye û êdî pir kêm têne gotin. Tenê li hin gundên Kurdistanê jî têne gotin. Ez bawer im ku li cihê cur ev dûrik hîn hene û dibe ku cuda bin jî. Heke mirov hewl bide xwe, mirovê karibe gelekan berhev bike. Bi baweriya ku xwendevanên Azadiya Welat wan berhev bikein.

**Ferhengok:**
**qewl:** hevpeyman
**heqîb:** cureyekî têrê
**şehîn:** alîkî tereziyê
**eyûn:** zêrên rûyê bûkê yê bi ser guhê wê ve ber didin.
**xirxal:** bazinê piyan an jî zêrên hûrik ku serê bûkê dineqişine.

ÇETÎN MÎZAN

www.arsivakurdi.org

# Nûdema nû derket

Hejmara 23'yan a kovara Nûdemê derket. Ev kovara çand û hunerî ku li Swêdê tê weşandin, bi pêşekeke xwedî û berpirsiyarê giştî yê vê kovarê Firat Cewerî dest pê dike. Cewerî de vê gotarê de li ser nameyên xwendevanan ku ji redaksiyonan kovarê re hatine bi rê kirin, radiweste.

Tê gotin ku ev name bi rexne û pêşniyarên xwe rê li ber amadekarên kovarê vedikin. Her wiha Cewerî dide zanîn ku ew ji hest û ramanên di nava nameyan de sûdê werdigirin, bi hinekan rûgeş, bi hinekan re jî xemgîn dibin.

Di nava kovarê de nivîseke ku gelekî balê dikişîne jî hevpeyvîna Mahmût Baksî ya ku bi Yılmaz Güney re kiriye. Ev hevpeyvîn berî çendekî bi mirina Güney pê re hatiye kirin. Di vê hevpeyvînê de Güney bi zimanekî vekirî kurdbûna xwe dide xuyakirin û qala hinek projeyên xwe yên li ser kurdan jî dike. Di vê hevpeyvînê de tesbîtên Güney ên li ser şoreşa Kurdistanê gelekî balkêş in. Lewre ew dide zanîn ku kêşeya kurd ji bo şoreşa welatên Rojhilata Navîn wekî kilîtekê ye.

Her wiha ew gelê kurd jî wekî dînamîka sereke ya demokrasiyê destnîşan dide. Dema mirov dibîne ku hê jî gelek kesên ku li ser navê çepgiriyê xebatê dikin, negihîştine vê astê, mezinahiya Güney careke din diyar dibe.

Ji bilî van nivîsan çend hevpeyvînên din jî di vê hejmara Nûdemê de




cih girtine. Yek ji van bi Serokê Înstituya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan re hatiye kirin. Nezan digel agahiyên li ser çalakiyên înstitûyê, li ser rewşenbîriyê jî bîr û ramanên xwe dibêje. Her wiha hevpeyvînek jî digel Ahmet Aras hatiye kirin ku ew jî bi giranî li ser zargotina kurdî û Evdalê Zeynikê ye.

Digel van hevpeyvînan gelek nivîsên cur bi cur di vê hejmara kovarê de cih girtine. Birek ji wan werger in, hinek jî bi kurdî hatine nivîsandin. Bo nimûne nivîsa Maria Paradowska "Kurd di weşanên Polonî de" ku ji hêla Sidqî Hirorî ve hatiye wergerandin şayanî behsê ye. Paradowska gelek agahiyên hêja li ser xebatên ku li Polonyayê der barê de kurdan de hatine kirin, dide.


Nîqaşa li ser alfabeya kurdî di vê hejmara Nûdemê de jî ji xwe re cih dîtiye. Ev nîqaş di navbera Celadet Çelîker û A. Zêrevan de ye û li ser tîpên "î/i" û "i/ı" ne. Di vî warî de tiştê ku balê dikişîne ew e ku, yekemîn car nivîseke bi /i/ û /ı/'ya tirkî di kovarê de cih girtiye. Bi dîtina me ev yek kêmasiyeke lewre, ev yek wê rê li ber hinekên din jî veke, da ku ew li gorî dilê xwe binivîsin.

Di vê hejmarê de kesên mîna Dr. Ciwan Batû, Fawaz Husên, Mehmet Uzun, Şerefxan Cizîrî bi gotarên xwe, Laleş Qaso, Sabah Kara, Ferhad Shakely, Rojen Barnas bi helbestên xwe balê dikişînin. Di kovarê de ji bilî çend helbestên bi kurmanciya jêrîn (soranî) piraniya nivîsan bi kurmanciya jorîn in.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Kaseta Hozan Xanemîr "Welatê Rojê" derket

Kaseta Hozan Xanemîr ya duwemîn bi navê "Welatê Rojê" derket. Taybetmendiya vê kasetê ya herî berbiçav hewla lihevanîna muzîka gelêrî û a nûjen e. Di kasetê de stranên ku ji aliyê naveroka xwe ve şoreşgerî ne jî balê dikişîne ser xwe. Her çiqas ev şêwaz (terz) ji bo Xanemîr nû be jî, di vî warî de serketî ye. Lê hunermend bi taybetî di warê strîna stranên gelêrî de pêşketî ye.




Hozan Xanemîr kaseta xwe ya yekemîn bi navê "Gul sor bûne" di gelawêja 1993'yan de derxistibû, di wê kasetê de bi giştî stranên gelêrî cih digirtin.

Navenda Çanda Mezopotamya ev salek e ku kasetên gelek bi kalîte derdixe. Produksiyona vê kasetê jî dîsa ji hêla NÇM'ê ve hatiye çêkirin û ji der ve û hundir gelek kesan ked dane ji bo pêkhatina vê kasetê. Kom plakê ji kaset tomar kiriye.

Kaset ji 12 stranan pêk tê. Bi taybetî 2 kilamên dengbêjiyê yên gelerî bi navê "Koçber im" û "Xalid Begê Cibrî" bi şêweyekî baş ji layê hunermend ve hatine gotin. Her wiha strana "Kela Bazîde" ku ji herêma serhedê ji aliyê Celal Ekin ve hatiye berhevkirin ji aliyê Hozan Xanemîr bi terzekî "Qesîdeyî" hatiye honandin.

Di amadekirina kasetê de diyar dibe ku, orkestrayeke gelek dewlemend di warê amûrên muzîkê de kar kiriye. Her wekî zirne, dahol, gitara bas, piyano, flût, cûra, blûr, erbane, tumba û ribab ku amûrên biyanî û rojhilatî ne hene.

## Xezîneyên Adenê

FAYSAL DAĞLI



Di pirtûkên pîroz de, ji bihuşta windayî Adenê û ji Dîcle û Ferad û ku wê av didin tê behskirin. Di Tewratê de navê van her du çeman tê gotin. Mekana baxçeyên Aden her çiqas neyê tarîfkirin jî, kifş e ku Aden Kurdistan e. Dîsa li gorî mîtolojiya pîroz, piştî rojgerena me gengaze ku bi gunehan dilewite, ji aliyê Yezdan ve bi avê tê paqijkirin, keştiya nû jî ku rêçên jiyana paqij diparêze, li ser çiyayên Kurdistanê rûdine. (Agrî an jî Ararat)

Di rîwayetên pîroz de û di mîtolojiyê de av wekî çavkaniya jiyanê tê qebûlkirin. Ger ku mirov bide berçav, şaristaniyên îro di hewzayên wek çemên Ganj, Nil, Ferad, Dîcle, Volga û hinekên din de şîn bûye, pêwîstiya avê di jiyana însanan a maddî û manewî de ji xwe ve derdikeve holê.

Lê, ew welatê ku jê, Dîcle û Ferad dizê û mirovahî li ser wê vejiya ye, ew bihuşta windayî, îro di pençeyê şer û talanê de bûye manzareyeke cehenemî. Belê ew çemên me yên ku demekê çavkaniyên jiyanê yên Mezopotamya û Rojhilat bûbûn du avên bihuştî, îro di destê dagirkeran de bûne du şûrên cehenemî.

Têgiha esasî, a ku di bin kolonîbûna welatê me de radizê, dewlemendiya Kurdistanê ye. Helqeyên herî mezin ê vê dewlemendiyê jî av û petrol in. Pevçûnên îro ên li ser cîhana me, ên di nav dewlet û miletan de, li ser çavkaniyên dewlemendiyê dertên. Sedemên ku Rojhilat û Kurdistan bi dehan salan e ji pevçûn, jenosîd û şeran re bûne sehne, di kûrahiyên bîrên petrolê û di kaniyên ava şîrîn de veşarî ye. Li gorî muhendîsên petrolê, welatê me giravek e, ku li ser deryaya petrolê ye. Dîsa li gorî endazyarên avê û ziretê, Kurdistan depoya ava şîrîn e. Yanê Kurdistana ku îro bûye cehenemeke şer, depoya ava şîrîn e û li ser deryaya petrole ye.


Di şertên normal de, rojane ji bîrên welatê me, 3 milyon û 200 hezar warîl petrol tê derxistin. Kara vê petrola xam tenê salane ji 2 milyar dolarî zêdetir e. Ava Kurdistanê hin jî pêwîstir û bihatir e. Wê nufûsa Rojhilata Navîn, 25 sal şûn de bigihîje dora 500 milyonî. Wareya vî tiştî, du qat zêdetir av e. Çavkaniyên ava Rohilata Navîn bi gelemperî ji çiyayên Kurdistanê yên bi bereket dertê. Ji van çiyayan çemên wekî Ferad, Dîcle Mûrad, Zap, Sîrwan, Xabûr, Qarûn, Aras û Elwend diherikin û hemû Mezopotamyayê av didin. Li her çar perçeyên welatê me li ser bi sedan çem, bi dehan bendavên hîdroelektrîk û yê avdanê hatine damezirandin. Bi van bendavan rojane bi milyonan kîlowat elektrîk tê hilberandin û tesîsên sanayiyê yên metropolên kolonyalist pê tên xebitandin.

Dewletên kolonyalist ku Kurdistan lihev parve kirine, çemên kurdan jî li dijî hev û li dijî kurdan bi kar tînin. Li Kurdistanê, bendavên wekî Bexme, Uzluce, Îlisû û Askî Mûsil bi armanca ku cografya û demografya ya Kurdistanê ji hev biqetînin, û seyrûsefera gerîla/peşmerge qedexe bikin, hatine avakirin. Projeyên wek GAP'ê jixwe, ayan beyan li dijî vejîna Kurdistanê ne.

Bi kurtayî av, dewlemendiyek e ku mirov nikare hesabê wê bike. Berî her tiştî, ji bo berdewamkirina jiyanê, mayiya esasî ye.

Qey wê kolonyalîst ji nebiyên xwe re mîrata xezîneyên Adenê bihêlin û emê jî Kurdistaneke cehenemî? Belê riya ku diçe bihuşta windayî Adenê, di yekîtiya kurdan, aşîtiya wan a navxweyî û têkoşîna wan a hevbeşî derbas re dibe.

Dewleta tirk nehişt Trêna Aştiyê were lê kesên wê bi trênê bihatana hatin




WELAT
Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

**Li ser navê Zerya Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. (adına)**
**Xwedî (Sahibi)**
CELALETTİN YÖYLER
..............

**NAVNÎŞAN**
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
**TEL–FAX**
(0 212)
251 90 13
..............

**Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni)**
SAMİ TAN
..............

**Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü)**
M. SALİH TAŞKESEN
..............

**Berpirsê Saziyê (Müessese Müdürü)**
TAHİR ELDEMİR
..............

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
..............

**BELAVKIRIN**
BİRYAY Dağıtım

**NÛNERÎTIYÊN ME**
(Temsilciliklerimiz)

**Brûksel:**
Medenî Ferho
**32 532 721 12 03**
**Suriye:**
Jan Dost
Helîm Yûsiv
**Berlin:**
Silêman Sîdo
49 30 69 00 26 95
**Hannover:**
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60
**Munchen:**
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84
**Stockholm:**
Robîn Rewşen
46 87 51 05 64
**Bonn:**
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
**Hollanda:**
Ferhat Zebarî
31 104 85 55 48

## Sekreterê Giştî yê İP'ê M.Bedri Gültekin:

# Ji kurdan re ji vê mezintir xizmet heye?

*Çima Trêna Sevrê?*

● Berdevkê Banga Hannoverê di 20'ê gelawêja 1997'an di rojnameya Ülkede Gündemê de wiha gotibû: "Em mafên ku li Yugoslavyayê hatinê dayîn, ji bo kurdan jî dixwazin." ev daxuyanike zelal û balkêş e. Ji ber ku Yugoslavya di warê kêşeya neteweyî de welateke bêgelemşe bû. Lê, bi destkariya împeryalîstan hate parçekirin. Ji ber vê yekê ev mînak ji bilî Sevrê tu tiştî ifade nake...

*Lê Almanyayê rê neda trênê...*

● Welatên împeryalist polîtîkayên yekane nameşînin. Almanya xwest ku xwe nêzî her du aliyan bike. Lê, ji ber ku Tirkiye reaksiyoneke tûj nîşan da, bi paş ve gav vêtin.

*Baş e. Mirov dikare bibêje tevgera kurd ji welatên împeryalîst re hevkariyê dike?*

● Ez naxwazim ji her alî ve nirxandineke bi vî rengî bikim. Berî her tiştî, dilê min tiştekî wisa naxwaze. Tiştê diyar ev e ku hin derûdorên ku çareseriyê kêşeya kurd ji navendên rojavayî hêvî dikin, hene. Konsolosê DYA'yê Stenbolê got: "Ezê jî herim pêrgîniya trenê" bi dîtina min, piştî vê yekê tiştekî bê kirin tune ye. Divê li dijî împeryalîzmê hevalbendiya gelan bê damezirandin.

*Gelo çepgirên tirk û gelê Tirkiyeyê ji bo piştgiriya tevgera kurd dereng neman û têr dike piştgiriya wan?*

● Berêvajî vê yekê tevgera çepgir a Tirkiyeyê û çîna karkeran kêşeya kurd wekî pirsgirêkeke xwe ya bingehîn dîtine. Dîrok û pratîka partiya me jî bi vî rengî ye. Ez dixwazin mînakeke bidim, di sala 1992'yan de hejmare kuştinên ku faîlên wan nediyar in, gihişte sê hezar kesî. Ev ji aliyê İP'ê ve hatin ronî kirin. Kî dikare rola İP'ê ya ji bo eşkerekirina Gladio înkar bike. Ma ji bo gelê kurd ji vê baştir xizmet heye....!

*Baş e, Ku ev "Trêna Lozanê" bûbûya we yê çawa binirxanda ?*

● Li Tirkiyeyê îro li ser navê çîna karkeran tevgerek heye. Lê di serdema 'şera rizgariyê' de rewşeke wiha tunebû. Îro çîna karkeren, li ser bingeha sosyalîzmê programek daniyê pêşiya xwe û ji bo çareserkirina kêşeya kurd têdikoşe. Ji ber vê yekê em nikarin wê têkoşînê ji bo îro wekî mînakeke erênî pêşkêş bikin.

*Nirxandinên wekî "planên împeryalîsta" çiqas rast in? Têkilidariya welatên împeryalîst ji aliyekî ve xurtbûna tevgera kurd nîşan nade?*

● Nêzikbûna welatên imperyalîst ne girêdayî dilpakiya wan e. Ji ber vê yekê nirxandinên bi vî rengî "Em xurt bûn. Ji ber vê yekê ji bêgavî (mecbûriyet) nêzikî me dibin" nîşaneya safikiyê (saflık) ye.

*Lê, diyar e welatên împeryalîst li dijî kurdan hevkariyê Tirkiyeyê dikin?*

● Min tiştekî wekî, DYA piştgiriya Tirkiyeyê dike an jî ya tevgera kurd dike negot. Jî aliyekî ve piştgiriya Tirkiyeyê ji aliyekî ve jî "karta kurd" di destê xwe de vedişêre.

*Birêz Perinçek, ji bo artêşê got "şoreşger" di warê kêşeya kurd de jî şoreşger û pêşverû ye?*

Artêş di vî warî de li ser şopa berê dimeşe. Artêş di nav saziyên herî giring yê dewleta tirk de cih digire û wekî dewletê tevdigire. Lê di vir de em balê dikşînin ser vê yekê, heke ku artêş li dijî îslamî û împeryalîstan helwesteke cuda nîşan bide, wê ji bo kêşeya kurd jî nîşan bide. Lê, ji bo vê yekê divê bi şoreşgeran re bibe xwediyê helwesteke hevpar.

## Ferhengok

**azfendak:** keskesor, heftreng
**avrûyî:** qaşo, goya
**barûdox** : rewş, zûrûf, hal
**belandin:** gotin xweş kirin
**berhembêzkirin:** bi awayekî pêşwazîkirin
**binfiskî:** bi dizî
**birdoz:** îdeolojî
**cemserî:** qutubî
**darî çavan:** li ber çavan
**daberîn:** pêşkêşkirin
**dizarî:** dilşikeştin
**dirav:** pere
**dunde** : zarok
**endezyar:** muhendis
**hevalbendî:** mutefîkî
**hewn:** aqil, raman
**hişmendî:** xudan zanîn (bilinç)
**karger:** îdarecî
**kujer:** bikuj, qetîl
**lêmişt:** lehî
**mandibûn:** westiyan, betilîn
**melaqî:** çanaxalêsî
**melisîn:** çavpankirin (sinmek)
**misrî:** negihîştî
**niva:** êdî
**nof:** kom
**pêşdîtin:** texmîn (öngörü)
**pirbêjî:** yê ku pir dipeyive
**resen:** xwerû, saf
**sewt:** deng
**şît:** aysberg
**tirat:** musabaqe
**tûp:** taxim
**toq:** tok (boyunduruk)
**vemalîştin:** vemalandin (sıyırmak)
**xavik:** laçik (başörtüsü)
**xirxal:** halhal

www.arsivakurdi.org

# Kulîlkên daran şax vedidin

**Tayîna Memed derdikeve Dêrsîmê. Memed bi vê yekê gelekî dilşa dibe ji ber ku li welatê xwe mamostetiyê dike. Lê hê li mamostetiya xwe germ nebûbû tevkujiya Meraşê pêk hat. Memed û çend hevalên wî dersan boykot dikin. Dewlet jî li hemberî vê yekê bê helwest namîne û Memed sirgûnî Afyonê dikin.**


Kurd li Tirkiyeyê mafê xwe yên herî bingehîn dixwazin. Ew dixwazin bi zimanê xwe perwerde bibin, li ser çand û hunera xwe xebatên zanistî bikin. Lê ev yek jî ji bo kurdan pir zêde tê dîtin. Kurd partiyên xwe ava dikin, bi piştgireyeke mezin mebûsên xwe dişînin meclîsê, kedxwaran ve an bi tevkujî an jî bi sirgûnî bersivê didin wan.

Hetanî niha çar partî bi piştgiriya kurdan hatin damezrandin. Ji van çar partiyan sisê ji aliyê dewletê ve hatin girtin. Her wekî tê zanîn di salên 1990'an û hetanî salên 1995'an mebûs, rêveber, endam û kesên ku piştgiriya van partiyan dikirin ji aliyê kontr–gerîla ve hatine kuştin. Mebûsê kurd Mehmet Sincar jî yek ji wan bû ku di 4'ê rezmebar1992'yan li Batmanê ji aliyê kontr–gerîla ve hate kuştin. Hefteya çûyî salvegera 5'an a şehîdketina mebûsê DEP'ê Mehmet Sincar bû. Li ser vê yekê em bi Cihan Sincar re axivîn.

Cihan Sincar di destpêka axaftina xwe de diyar dike ku, ew û Mehmet Sincar lêzimê hev in. Li gorî daxuyaniya Cihan Sincar, Mehmed Sincar di dema dibistana navîn de fêrî hin tiştan bûye. Bavê Cihan Sincar li Mêrdînê mamostetiyê dike. Mehmed jî gelek caran diçe ba bavê Cihanê Cihanê. Bavê Cihan ji Mehmed re qala kurdîtiyê dike û dibêje: "Lawo divê hûn hînî hin tiştan bibin, zana bibin. Di pêşerojê de hûnê gelek pêwist bin." Li gorî Cihan Sincarê ev gotina bavê wê li ser Mehmed Sincar gelekî bandor kiriye.

Piştî ku Mehmed diçe zanîngehê bi Cihanê re dizewice. Mehmed hê dema di dibistanê de dixwîne du zarokên wan tên dinyayê.

Tayîna Mehmed derdikeve Dêrsimê, Mehmed bi vê yekê gelekî dilşad dibe û dibêje: "Ez gelekî kêfxweş im ku ezê li welatê xwe mamostetiyê bikim." Lê hê li mamostetiya xwe germ nebûbû tevkujiya Meraşê pêk hat. Mehmed û çend hevalên wî dersan boykot dikin. Dewlet jî li hemberî vê yekê bê helwest namîne û Mehmed Sincar sirgûnî Afyonê dikin. Mehmed li Afyonê di rewşeke gelek nebaş de dimîne. Heta Cihan Sincar dide zanîn ku ew li Afyonê jî ji aliyê gel ve hatina kevir baran kirin, hema bêjin ku ji mirinê xelas bûne. Mehmed Sincar li ber vê yekê îdare nake û tê Mêrdînê. Daxwaznameyekê dide perwerdehiya millî, ji bo ku cihê xwe biguherîne. Lê ev yek pêk nayê û di demeke kurt te kaxizek jê re ji meclîsê tê û dibêjin ku, em nikarin qedera van zarokan bixin destê te, sola te nepaqije.



Mehmed wê demê dikanek vedike, malzemeyên inşatê difroşe. Ji bo ku rojên cejnan ala Tirkiyeyê bi dikana xwe ve nedaliqanidiye, ji aliyê polîsan ve tê tehdîtkirin. Her wiha Cihan diyar dike ku wê demê du birayên Mehmed di nav refê gerîla de şehîd dikevin; Kamuran û Ramezan. Mehmed ji bo ku laşê Ramezan ji destê dewletê derxe bi rojan deriyê malê venekiriye. Li ser vê yekê zordestiya dewletê li ser Mehmed behtir dibe.

Li gel van tiştan dema hilbijartinê Mehmed dibe berendamê mebûstiyê. Berî ku Mehmed Sincar bibe berendam bi pîreka xwe re li hev rûdinin û Mehmed dibêje: "Ev barekî giran e, lê gel em laîk dîtine daxwaza gel beriya her tiştê me ye" wekî tê zanîn ew ji DEP'ê mebus tê bijartin.

Cihan Sincar dide xuyakin ku; wê demê gelek kes ji aliyê kontira ve dihatin kuştin, gund dihatin şewitandin, Mehmed Sicar jî gelekî digeriya. Ji ber xebata wî dewlet jê gelekî aciz bûbû. Mehmed Sincar li hemberî van yekan mirovekî fedekarbû. Di vir de Cihan Sincar bûyereke ku di serê Mehmet Sincar re derbas bûye dibêje: "Niştecihên Zeytûna Mêrdînê ji bo derd û kulê xwe bibêjin bang dikine Mehmet Sincar. Dewlet dixwaze gundiyan bi darê zorê bike cahş. Mehmet Sincar û çend hevalên xwe diçin gundê Zeytûna, lê ketina wan gund ji aliyê serokcehş tê asteng kirin. Mehmet Sincar dibêje: "Ez mebûs im, divê bi gel re biaxivim", lê serokcehş li hemberî vê daxwaza Sincar, berê tivinga xwe dide wî û carekê maşekê (tetik) dikişîne û dibêje heger ku naxwazî maşeka duyemîn di serê we de biteqe ji vir dûr bikevin." Mehmet Sincar jî wê fîşeka v la tîne malê şanî Cihanê dide.

Carekê bi ser mala bavê Mehm Sincar de digirin. Bavê Mehmet Sinc heft rojan di binçav da dihêlin. Jê re d bêjin: 'Binêre du kurên te mirin, wê jî ji destê te here.' Berî ku Mehm Sincar şehîd bikeve, bi deh rojan ba wî xistine binçav. Bavê wî gefên ku wî hatine xwarin, radigihîne ew li hemberî vê yekê bi dil kî hênik û bi henek bersiv d de û dibêje: "Karê wan ev Ez zanibim ku rojekî em min mayê jî, ez dîsa dev karê xwe bernadim."

Belê piştî vê telefon bi deh panzde roja Mehmet Sincar diç Êlihê (Batman) Li Êl hê di hotelekê de cih dibe. Ji wir ew telefonî pîreka xw dike, dibêje: "V ye em gihiştin Êlihê." Piştî wê telefona hew Mehmet Sinca deng derdikeve. Roja di danê êvarkî Bankal Caddesi ber eczane yekê dib hedefê fîşekên ça kor.

Ew germiya ku li laşê Mehme Sincar belav bûbû ne germiya havîn bû, ew germiya nîşana xeweke dûv dirêj bû.

Dareke şîn ku rişên xwe berdabû nava kûrahiya erdê welatê xwe, bû şeh dê doza welatê xwe. Ew serbilindî jî û bi serbilindî çû ser dilovaniya xwe.

Li gorî Cihan Sincar zanîngeh ji b mirovekî her tişt e, li wir ji bo pêdiviyê şexsî tê xwendin. Lê mirov di zanînge ha têkoşînê de jiyana gel dibîne. Miro fêr dibe, zana dibe, Cihan Sincar dixwa ze ku her kes bi qasî Mehmed bibe şa girtekî baş ê vê zanîngehê.

AZAD ALTU

www.arsivakurdi.org